

•

Zembîlfiroş

Abdusamet Yîgît

Weşanên

.
. .
. .
. .

*Zembîlfiroş
@Abdusamet yigit*

2010-Almanya-Berlin

.
ISBN 968-4-930991-34-0

Destana Zembîlfiroş

Li welatê kurdan merwanî demek xweş a şad û baxtîyar dihat jînkirin. Ew demek dirêj bû ku aramî û xweşî li nava wan serwer bê. Dilxweşî, kêfxweşî û xweşbînî ji nava wan nekêm bû. Li her heft dûwelên welatê kurda ji dema şadadî û heta wê demê wê, her tişt wê di xweşî û aramîyê de wê bi rêve biçê. Çûn û hatin di nava mirovan de wê, bi wê xweşiyê wê bibê. Merwanî demek nû. Piştî Aliyê kûrê merwan û dema wî û pê de wê, demek pirr zêde xweş wê li wlêt wê hikm bikê. Li giştî kurdistanê wê serwerîyek bê sînor wê were demezrendin.

Çi dihat gotin ji wan dihat pirsîn. Qasra merwanîyan wê, şewîrîyên xalifetiyê jî wê bidan li dora xwe. Wilqasî mazin û xwedî rûmet bû. Merwanî wê, di wê demê de wê, ji ber şamê û heta ber bahra hûrmûz wê, di qadek berfireh de wê, bi desthilatdarîya kurd wê, hevnasîn bikira. Di nava walêt de wê, ji aşîrîyê zêdetirî wê êl heban û her êlek weke welatekê wê di herêma xwe de wê, xwedî hêz û bandûr ba. Ji sêrî heta binî wê ew di hiyararşiyekê de wê, hebûba.

Li herêma botanê ku wê nav dengê wê, hertimî li ser zimanan bê wê, di wê demê de jî wê bi zanîn û fahma xwe ya mazin wê li hişan ba. Wê ji gelek deveran wê mirovan wê qastî wê deverê bikira bo xwandinê.

Ji hemû deverên cihanê wê, zaneyên mazin wê bihetan wir û wê zanîna xwe li hev bipîvan. Wê li wir zaningehî her demê wê hebûba. Wê ber vê yekê wê herkesek wê bigihîşt a wir.

De ne, haçîka mîr ba wê, li herêmê wê ne weke serekê aşîran wê biheta nasîn. Ji xwe ji mîran re ev bihata gotin jî wê weke haqaretekê wê biheta nasîn û wê ti kesekê ew ne hanîba ser ziman. Divîyabû ku ew êl ba ku ew bi wî biheta ser ziman. Êl wê, weke miletekê mazin, û li herêmek mazin belav ba. Di wê temenê de wê, ew jî wê wusa ban.

Lê li herêma botanê wê heta ya mayafarqînê wê, di qadak mazin de wê, ew yekbûn, aramî û bibaxtî wê hebûba. Di wê demê de wê, di nava kurdan û xalkên bi wan re dijîn weke ermen, asûr, êzîdî û hwd jî wê bi heman rengê wê, hebûban. Êzîdî wê ji herêmên li dora serhadê heta muş û deverên weke şadadê û şengalê wê, di qadek mazin de wê, bi êlî wê bijîyan û wê, hijmaran wan wê bi weke kesên ku ew di heman baaweriyê de ban wê bi deh milyonan û wê hebûban.

Li herêma botanê wê êzîdî jî û cihû jî wê, hebûban. Wê ew jî wê bi reng û awayê xwe re wê bi bijîyan. Ti kesekî wê bahsa hevdû bi xirab

nekiriba. Wê gotinên bi hêrs û nefretê wê ji hevdû re nekiriban. Wê yek ji temenê tifaqqa wan jî wê ev bûba.

Di wê demê de wê, merwanî wê, piştî malbate eyûbî ku ew ji ji malbate merwanîyan bûn ku wê ji herêmên diwînê û wan wê werina wê herêmê wê, ew wê, bê temenê pêşketinek din jî. Wê di wê demê de wê desthilatdarîya şadadîyan ku wê nêvî kurdistanê wê di bin deesthilatdarîya wan de bê û wê, heta gelek herêmên qafqasan jî wê di destê wan de ban wê, bi wê serdestîyê wê li herêmê wê mazin ban. Lê gelek hêrîşên komên hov ên tirk ên ji aliyê hazarê ve ku wê werina herêmê wê, ew wê bina sedema ku wê hertimî wê herêm bin hêrîşên hov de bijî bê.

Lê dem di wê ve diçû. Herêmên rojhilatê kurdistanê wê di wê temenê de wê, weke herêmna ku ew di wê temenê de wê, di nava hêrîşan de bin. Malbate eyubîyan ku wê werê herêmê wê di wê demê de wê, tifaqak nû wê di nava şadadî û merwanîyan de wê di wê de wê çêbikê. Ew jî wê bê sedem û temenê bilindbûna demek din di bin serkêşîya eyûbîyan de. Wê, di wê demê de wê ew jî wê, ji mayafarqînê û heta rihayê wê ji xwe re wê bikina navend. Eyûbîyan bi zanebûn ew herêm ji xwe kiribûn navend. Bo ku wê ji wê aliyê ve wê, pêşîya hêrîşên komên tatar û serçûqîyan wê bigrin wê bikin. Wê bi ser jî kevin. Lê demek têve diçê û wê ev dem wê hin bi hin wê pêşkeve. Demek nû wê giştîya kurdistanê ku wê bikê nava xwe de wê, pêşkeve. Eyûbî wê piştî wê tifaqê wê, mirgehên rojhilatê kurdistanê jî wê xort biikin û rakin serpîyan bi hêz û ew jî wê, bê sedema ku ew bi wê pêşîya hêrîşên ji aliyên asya wê werin ku ew bi wê pêşîya wan bigirin û digrin jî. Ev jî wê, di wê demê de wê, demek zêr a bi aramî wê, li herêmê wê bi xwe re wê bide çêkirin. Di wê demê de wê ji herêman li herêman qafîle bi qafîle wê mirov wê herina herêman. Wê kerwan bi kerwan wê çûyina ji herêman li herêman wê bi ewlehî wê bibê. Ev dem wê weke demek dema merwanîyan û deme wan a xweş jî wê were bi navkirin. Di wê demê de wê, ev wê weke demek pêşketî jî wê were dîtin.

Qasra merwanîyan wê li herêmê wê serdest bê. Wê di wê demê de wê, ji herêmên botanê û heta herêmên weke mayafarqînê wê, çûn û hatin wê bi hesanî bin. Wê ev weke herêmekê jî wê bi herêmên rojavayê kurdistanê re wê bîn dîtin û wê werina ser ziman.

Di wê demê de wê, li qasra merwanîyan a li mayafarqînê ku wan avakirîya wê, çûn û hatina li wê mazin bê. Wê bi wê re wê, hertim

kerwan wê werin û herin. Wê cihên mêhvanwariyê wê hebin û wê ew li wê bimênin.

Dema ciwanîya Zembîlfiroş

Di nava herêmê de wê, qasra Mîr **Nesredîn** jî wê ber çemê diclê bê û wê, ew jî wê, bi nav û deng bê. Wê weke qasreka mazinekê giştîya civakê wê were dîtin. Wê hertimî wê li wê were nerîn. Di qasrê de wê, Mîr **Nesredîn** wê, bavê sê kûran bê. Ew jî wê Sêda, Kanan û Merwan bin. Wî xwestibû ku ew navê Merwan ji xwe cardin rabê. Di nava kûrên wê yê herî mazin wê Sêda bê û Sêda wê weke kesekê bi hûner û zane jî wê werê dîtin. Lê wilqasî levhatî û sipahî bû tedigot ku qey wê weke takrihan. Piçek nûrha hatîya ser rûyê ardê bê.

Bi wê levhatî û bedewiya xwe ew dihat dîtin. Bavê wî ber ku wî rojekê di civate wî de wê, bêjinê de ku kûrê te pirr levhatî ya û ma tê kengî wî zewcînê wê ew hingî wê şikna bi kê serê bavê wî û wê ew jî wê, di wê demê de wê di cih de wê, biryarê bide ku ew kûrê xwe Sêda ku wê di hin gotinna de wê bigotan 'weke yusuf sipahiya' wê di cih de ew wê bê zewicandin. Keçek bi navê **Rênaz** ku ew jî keçmîrek ji herêma botanê bê wê ew bi wî re wê bê zewicandin. Wê, di wê demê de wê, Sêda û rênaz wê dema ku wê werina Zewicandin wê ew wê hingî wê pirr zêde ne bi temenêkê zêde mazin jî bin.

Lê di wê temenê xwe de jî wê, zawaca wan wê werê kirin. Wê bi dawatek ku wê gelek rojan wê li ardê bimênê û wê ji gelek deveran wê kes herinê de wê ew wê bizewicin. De ne, kûrmîrek wê bi dawatek hesanî wê ne zewicî ba.

Sêda wê, di nava xalkê de wê weke kesekê ku ew di hûnerîya xwe ya bi nêçîrwanî jî ku ew zêde jêhatîbû dihat nasîn. Wê, hertimî wê bi herdû birayên xwe re wê, çûba nêçîrê. Wê dema ku ew çûban nêçîrê jî wê ti demê wê dest vala ne vegeîya ban.

Wê di male xwe ya ku ew weke beşek ji qasrê jî dihat dîtin wê di wê de wê, sêda wê bi hevîna xwe re wê bijîya. Gelek têve neçû wê, zaroya wan ya pêşî bi navê Rênas wê were dûnyê. Wê, ew jî wê weke ku wê di nava xalkê de wê bê gotin wê weke gûlek ji nava dilê wan ba. Wê bi wê re wê êdî wê, dema xwe wê derbas bikiran. Sêda wê, piştî ku wê zaroya wî ya pêşî bû, wê êdî wê zêde weke berê wê neçê nêçîrê. Wê hê zêdetirî wê demên xwe li male xwe wê derbas bikê. Wê bi jin û zaroyê xwe re wê bi bûhûrênê.

Hinekî din dem têve çû wê, keçek wan a ku wê weke tah **Rihan** xweşik û ku ew jî wê navê wê bikina Rihan wê were dînyê. Wê, ew jî wê ji wan re wê bê gûlek din a ber bêhna wan. Wê pirr zêde wê bi wê re şa bin û wê dema xwe derbas bikin. Wê jîyane wan wê di nava kêfxweşiyê de wê derbas bibê. Sêda de ne, ber ku ew kûrmîrek bû wê zêde wê bi tifra û li şahiya dilê xwe wê bigerîya. Wî weke ku wê tişteke ji kêfa dilê xwe kêmanedihişt. Wê di xweşiyê de wê bijîya.

Pişti ku wê zaroya wan a duyem wê were dînyê û piştê ku wê dem hat zaroya wan a sêyem ku wê were dînyê wê, Sêdan wê weke berê wê dîsa tama wê herê ser çiyina nêçîrê û wê, dîsa wê bidest avêtina tîrûkava xwe li milê xwe û wê herê bi ber deverên gûr ên daristanê de ku ew nêçîran bikê. Carna wê bi tenê wê herê. Û çarna jî wê bi birayên xwe re wê herê.

Hertimî jî wê di nêçîrên xwe de wê serkevî bê. Wê di nêçîrên xwe de wê, pirr baş bê. Sêda rojekê ew diçê nêçîrekê û ew pirr zêde nêçîrê dikê. Wê, gelek nêçîrê bikê. Birayên wî ku ew bi wî re na wê, nêçîrê nekin û hema wê tenê nêçîrên Sêda ku wî kirina wê rajina wan lê wê nikaribin. Hingî wê zêde nêçîr kiribû. Wê rojê Sêda pirr zêde kêfxweş tê ku ew werê malê. Lê roj li wan dibê şev û ew wê rojê çî çiyê li deverê bi ewla ku ew ji xwe re dibînin di keviya şikeftê ku ew di lat de weke hatî kolandin de wê, bimênin. Wê ew wê li wir wê agirekê xwe pê bixin û wê ji xwe re nêçîreka xwe wê, bi wê li ser êgir jî wê çêbikin û wê, bixwûn. Wê kêfa wan wê li cih bê. Wê dem bi dem wê bi gotinên ku ew wê ji hevdû re bêjin jî wê henekokan wê li hevdû bikin. Wê, roja xwe wê bi xweşî wê di wê demê de wê derbas bikin û wê, şevê li wir bikina sibeh. Wê heta demê dereng wê li hevdû rûnihin wê ji hevdû re biaxifin. Wê, civate sê birayan wê heta demê dereng wê di nava wan de wê bibê. Piştî ku wê, dem li wan bê dereng wê, ew jî wê bikin ku ew hinekî çavên xwe rehet bikin û razihin. Lê wan di nava xwe de biryar da ku ew yek ji wan bimênê şiyar bo ku tişteke newê serê wan. Piştê di demê nîvê şevê de ew herê yek wan ê din rakê û ew êdî razihê. Ev wê, dema ku ew di nava xwe de wê biryarê didin êdî wê li wir wê, li ser cihekê ji gaya ku weke 'arzêl' ew ji xwe çêdikin wê li ser wê razihin. Lê dem li wan zêde ne sekinî û ne bi gelekî re tê ku ew were ber sibehê. De ne, berî ku wê, roj wê were ber sibehê wê, demê ne zêde rohnî û ne zêde reş jî wê, berî demê fecra sibehê wê derkeve. Di wê demê de wê, hinekî hinîkayî wê hebê. Wê di wê hinîkayiyê de wê, pirr zêde wê xweş bê ku mirov di nava nivînên xwe de kêfa sibehê bikê. Piştê ku berî ku roj derkeve û hinekî bû sayî

wê, ew jî wê, ew jî di rabin û kare xwe dikin ku ew bikevina rêya malê de.

Ku rabûna xwe wê, di demek pirr zêde kort de wê xwe li xwe bidina hevdu û wê xwe amede bikin. Wê piştê wê, di wê demê de wê bikin ku wê, bikevina rê de. Sêda xwe li Merwan zivirand kare pêre axiftinê kir û kir ku ew bi wî re biaxifê. Merwan weke birayê wan ê piçûk bû. Kê ji wan çî ji wî re bigota wî jî weke wan dikir. Weke mirovek hir û halim dihat dîtin û nasîn. Merwan fahmkir ku birayê wî yê mazin berê xwe daya wî ku ew bi wê re biaxifê. Wî jî wî karekê ku wî dikir di wê kêlîkê de wî dest ji wê berda û li ber birayê xwe li ser du lingan ma sekinî weke li bendî gotina wî ya ku ew ji wî re bêjê sekinî. Sêda bi nêht bû ku ew ji wî re biaxifê. Lê di wê navberê de awirek bir ser Kanan ku ew çî dikê. Di wê demê de Kanan xwe kar dikir ji çûyinê re. Sêda berê xwe Da kanan û ji Merwan re axift.

-Keko hinekî rêya me dirêj a. Em nûha bikevin rê ancax em danapaza bigihina malê.

-Rasta keko, ma em çî bikin? Dibêjê em hinekî dibin bimênin û nêçîrê bikin?

-Min nêht bi wê bû. Lê me li vir kir şev. Ka am pêşî herina malê binerin ku ma li malê rewş çî ya?

Di wê demê de Kanan ket nava axiftinê û berê xwe da Sêda û ji wî re got ku "bavê me hertimî ji me re dibêjê ku hun li kûderê ji bin pêşî xwe bigihênina malê û piştê karê xwe bikin." Ne hun dizanin ku bo me weke kevneşopêyekê çendî mal giring a."

Merwan ew got û wî piştê dîsa xwe bédeng kir. Karekê ku wî dikir ew tiştên ku ew bide piştê xwe ew bi hev ve kar bikê û bide piştê xwe ew bi wê ve mijul dibû. Sêda weke ku wî nêht kir ku ew gotinek din bêjê. Lê wî weke ku wî gotina xwe qûrtand. Ma sekinê. Di wê dema sekinî de jî wî awirek bir ser Merwan weke ku ew bixwezê ji wî re tiştêkê bêjê. Lê wî tiştêk ji wî re negot. Tenê wî ya ku wî kir destê xwe bir ber devê xwe û li ser simbelên xwe yên ne zêde mazin re bir û hanî.

Lê hê jî Merwan weke ku ew li bendê bê lê nerî. Awirên xwe ji birayê xwe yê mazin ne vaqatand. De ne, birayê mazin weke bavê birayên piçûk jî dem bi dem dihat dîtin. Wê gotina wî ti carî ji aliyê wan ve wê li ardê ne hatiba hiştin û wê, bêhûmetî ti carî bi ti awayê li hemberê ne hatiba kirin. Ev wê weke adetek civatî a pirr zêde kevn bû.

Di nava wan de wê yê ku weke di amedekariya xwe de zêde bi zîrekî tevgerîya û xwe pêşî dabû amedekirin wê Kanan ba. Wî xwe amede kir û

weke li bendî wan nerî. Pêşî li nava Çavên Sêda nerî û weke ku ew ji wî re bêjê ‘dê êdî ez amede me ji çûyinê re.’ Kanan jî ne kêmi Sêda nêçîrwanekê bi hûner bû. Wê hertimî wê di nava xalkê de ew jî wê li pêş ba. Di tîr avêtina xwe de wê, ku wî diavêta çî ew tişt ji wî xilas nedibû. Wusa weke kesekê bii hûner û zîrek bû. Piştî ku wan xwe amede kir wê di cih de wê, bidest ketina rê de bikin. Divîyabû ku ew hinekî baldar ban. Ber ku wê, ne kifşbû ku wê ji kû ve wê, tiştina nexweş wê derketan li hemberî wan. Di wê demê de jî wê komên hov wê li deveran wê bigerîyan û wê mal û keriyên sawalan wê bi şalihandan. Ji wê re jî ew divîyabû ku ew heyîdar ban. Bi wê re jî ew divîyabû ku ew li canê xwe miqayet ban. Dem hinekî din têve çû û piştî wê her sê bira wê bi hevdu re wê, bikevina rê û wê bi lingên bilez wê bidest hatina bi ber male xwe ve wê bikin. Weke ku wê hinek di pay wan de bin wê wusa wê bi lez wê werin. Sêda lingên wî sivik bûn. Ber vê yekê ew li pêş diçû û heta ku wê hinek gav weke navberê wê di nava wî û birayên wî de jî wê hebû ba.

Di wê demê de wê deng ji ti kesekê dernediket. Tenê dengê ling û qavzên wan dihat. Lingê wan li kevirên ku ew li wan diket û ew kevir jî ku ew dipekin û li kevirna din diket û dengê ku wê derxista wê, ji wê dengê û pê de wê ti deng wê nebûban. Çola ku ew di wê de dihatin wê, weke deverek beyer bû. Wê zêde dar li wê nebin. Lê ardên rast û paqij weke ardên çandiniyê bin hebûn. Hinekê ku ew di wê ve çûn wê, Merwan ji wê heya xwe bi di rê de dimeşê re wê, çavên wî herina ser hêlinek têtîyan ku ew wê, di wê de wê sê hêk wê hebin. Merwan li ber wê sekinî. Di wê de di aqilê wî de derbas dibê ku ew xwe bi tawênê û destê xwe biavêjiyê de. Lê wî dizanî ku têtî weke tayrikek ku wê destê kesekê ku ew li hêlin û hêkên wê ketiba wê ew êdî wê hêlinê wê bisilikênê û wê carek din wê newê wê hêlinê. Ber vê yekê wî ew newir Kanan xwe gihand Merwan û jê pirsî ku “keko çî bû.” Hê ku Merwan bersiva wî ne dayî çavên wî bi hêlina têtîyê ket. Sêda ew weke bêserî û bêdeng ew di rê de diçû û piştî ku Merwan û Kanan hinekî sekin in ew hinekî bi wê ji wan dûr jî ketibû. Weke ku ew ne di farqê de jî bê diçû di rêya xwe de.

Piştî Kanan gota Merwan “dê hedê keko bilezêna. Em bigihin Sêda. Meyzê ew ji me dûr jî ket. Merwan bersiv da kanan û ji wî re got;

-Ti kesek bi leze lingê xwe ne di wê hûnerê de ya ku ew bigihijê Sêda.

-Rast a. Lingên wî sivik in. Ew jî bi wê xweş û bilez diçê.

-Rast a, dê hedê em jî bilezênin. ..

Ku wusa ji hevdû re gotin wan jî da rex hevdû û hinekî li şûn Sêda dest bi çûyinê kirin. Wan hinekî hinekî qavzên xwe lezandin ku ew bigihina Sêda. Lê hinekî weke ku zor ji wan re ku ew bigihina Sêda. Sêda pirr zêde bi lez diçû. Bi wê hûnerîya xwe ew mirovekî pirr zêde xwedî lefleks jî bû. Ber vê yekê ew weke kesekê destzû dihat dîtî û nasîn.

Merwan û Kanan çî kirin û nekirin wan xwe gihand nêzî Sêda. Sêda ku ew gihişt ber deverek weke tilmanekê bilind êdî weke ku wî gavên xwe hêdîka bidest avêtinê kirin. Kanan mereq kir ku gelo Sêda bidest hêdîçûnê kir gelo ew di serê wî de hinekî nêçîrkirin derbas dibê. Lê ne kanan û ne jî Merwan ti gotin ji devê wan derneket. Ew jî tenê bi gav avêtinên xwe re alaqaader dibûn. Sêda het ber keviya bilind a tilman û ma sekinê. Ji serî bi ber jêr ve nerî. Dema ku ew sekinî êdî herdû birayên din jî gihiştin li dahma wî û mana sekinê. Kanan jî û Merwan jî li nava çavên wî nerîn û li bendê weke li bendî gotinek ku wê ji devê Sêda derkeve mana sekinî. Sêda weke demek ne zêde kin ma bêdeng. Gotin ji devê wî derneketin. Di wê temenê de wê, di awayekê de wê, rewşek weke ku ew li nêçîrê dihizirê bi rûdana wî re afirî. Kanan li hemberî wê rewşê xwe negirt û berê xwe rêyê xwe da Sêda û ji wî re pirsî û got; -

-“keko çî bû. Çî di serê te de derbas dibê?”

Sêda hinekî din bêdeng ma li hemberî gotinên kanan ku wî ji wî pirsîn. Sêda di wê demê de awirên wî hinekî li dûr dinerîn. Li pêşîya wan wê weke komek gijlonek weke daristanekê dihat dîtî. Lê Ew ne komek dar ku weke reşiyekê li ber çavên wî dihat dîtî. Komek mirov bû ku ew li berçavên wî dihat dîtî. Heta wê demê jî ew bi awirên kanan jî û merwan jî ne ketibû. Dema ku Kanan kar kir ku ew weke pirsra dúbare bikê ji Sêda re wê demê Sêda weke bersivê tenê gotinek got ji Kanan re û got ku “Meyzê!” û teliya xwe bi wir ve kir. Devera ku Sêda teliya xwe bi wê ve kir hingê ew ket berawirên nerîna Kanan de û wî nerî li wê aliyê û hingê ew ya ku Sêda didît wî jî ew dît. Bi wê dîtina xwe re wê dilê Kanan jî û Merwan jî ku wan ew dît wê weke zûtirin wê bidest lêdanê bikê. Ew kî bûn. Komek komên hov ku ew hêrîşî herêmê dikin, gelo? Ew hizir çû ber dilê wan. Lê Sêda fahmkiribû ku ew kî na. Wî fahmkiribû ku ew komek mirov ku ew ji xwe re bi malbatî bi hevdû re derketibûbûna seyranê bûn. Hem ji xwe re gaya weke yên pancar, tolik, kereng û hwd berhev dikirin û hem jî ji xwe re xwarin çêdikirin ku ew bi hevdû re li wir di nava wê firezeye şî de rûnihin û wê bixwûn. Ew berhevkinên weke şînahiyên wê ji wan re wê, weke amedekariyên demsalên piştî ku wê werin re bin. Di wê demê de wê, di aqlê Sêda de derbas bû ku ew herê

cem wan û silevekê bide wan. Wî jî ew ya ku ew di aqlê wî de derbas bû kir û berê xwe da bi wê aliyê ve û bidest çûyinê bi ber wan ve kir.

Sêda berê xwe da bi ber wan ve û ew çû. Piştî herdû birayên wî dana li dûv wî. Sêda kesekê bi tifra, mazin û mîrzade bû. Ew ji her rewş û halê wî dihat dîtî û fahmkirin.

Piştî ku ew çûn û hinekî meşîn wê piştî wê bi qadarekê wê bigihijina li wir, li cem wan kesên ku ew bi hevdû re wê, karê dîkin. Li wir wê gelek jin û mêr û zaro wê bi hevdû re wê, bi malbatî hebûban. Dema ku wan Sêda û birayên wî dîtî wan di cih de ew weke ku ew naskirin. Sêda wê kûrê **Nesredînê Ahmedê** kûrê Merwan bê. Ew jî wê kûrê memehîde kûrê Saîdê kûrê merwan bê. Ew jî wê di qasra merwanîyan de wê, weke malbate sereka ku wê li her deverên walêt wê ji wan wê hebin û wê welat wê bi rêve bibin bin. Ew di hatina nasîn. Sêda hat ber mirovên ku ew bi hevdû re li ardê tiştina weke şinahî berhev diikirin wî di cih de ew li berî wî rabûna ser xwe. Yekî ku ew pirr zêde pîr û kal bû ber bi Sêda ve bazî û karkir ku ew herê destê. Hê ku ew ne gihiştîyê de ku ew bi dengekê ku ew dengbikê got “Saîdê min ê delal hatîya, bi xêr û selemet hatîya”. Dema ku wî kar ku ew herê destê wî, hingî Sêda destê xwe bi şûn ve kişand û ne hişt ku ew destê wî maç bikê. Ber ku ew weke bêhûrmetiyekê di nava civakê de dihat dîtî ku mirovekê ji wî maztir destê wî maç bikira, ku ew çendî mîrzade ba û ku ew kurkeye jî ba.

Sêda kesekê ku ew di derbarê şop û kevneşopiyên xwe de ew bizanebû. Ew weke her zaroyê hê ku ew piçûk bû wî dest bi fêrbûna wan ji mazinên xwe kiribû. Di wê temenê de ew weke kesekê bi zane bû. Lê di wê temenê de wê, Sêda wê, dema ku ew gihişt wir wê, di wê temenê de wê, di aslê xwe de wê, di rewşek wusa de wê tevbigerihê ku ew xwe ji wir zûka ji wir herê bê. Weke ku ew leze wî hebê tevdigeriya. Ew ji aliyê kesên li dorê ve dihat dîtî. Lê di wê demê de wê dema ku ew hatibûbûna wir êdî gelek kesên din jî ew hatin û li dora wan bûna kom. Bi zaro, jin û mêran re li dora wan bûna kom. Sêda û herdû birayên xwe di nava wan de mabûn. Ber vê yekê wî di wê demê de wê, nizaiban ku wê çî bikiran. Birayî wê Kanan hertimî heya wî li ser wî hebû. Ku wî tiştê bigota û ankû nişanayek bi awirên xwe bida wî ew wê di cih de wê, fahmbikira. Di wê temenê de wê, ew di derbarê zimanê bi awir û xûyan jî wê li wê serwerîyek di nava mirovan de wê hebûba. Vêca kesên weke wan mîrzade wê, bi zêdetirî jî wê di wê rewşê de wê, serwertir ban.

Piştî ku ew hinekî li wir man û kêliyekê bi wan re rûniştin û het ku hinek xwarina baş ku wan ji xwe re hanîbû bi wan re parvekirin û wan

çend parî ji wê xwarin û pê de xatir ji wan xwestin û ketina rêya xwe ku ew werina malê. Di wê demê de wê, Sêda wê di awayekê de wê pirr zêde wê, di rêya xwe de wê bixwezê ku ew zû herê. Gav û qavzên xwe zûtir û dirêjtir diavêt. Ew di hat dîtî ji aliyê birayên wî ve. Merwan weke birayê wan ê piçûk diikir ku ew ji wan qût nebê. Ber vê yekê ew bêhn bi bêhnê mabû. Dikir ku ew bi wan re bimeşê. Ne di xwest ku ew ji wan li şûn biimênê. Ku ew li şûn maba wê wî ew ji xwe re weke kêmesîyekê wê bidîta. Ber vê yekê wî ew didît.

Ew jî weke ciwanekê xort û li xwe hatî bê. levhatî jî bê. Bedew bê. Di kirin û gavavêtinên xwe de wî hertimî dikir ku ew weke bi zane û di farqê de tevbigirihê. Ber vê yekê ew hertimî wê heya wî li ser birayên wî ba.

Dem bi dem wê di civatê de ku ew wê li rex bavên xwe wê di nava mirovan rûnihin ku ew li wan bihisênin wê li rex Sêda wê rûnihê. Sêda wê, weke kesekê ku ew wî pirr zêde nêzî xwe didît bû. Merwan weke ciwanekê ku ew nûka balix dibû û simbêlên wî nûka xwe didan dîyarkirin.

Demek dirêj bêî ku ew di farqê de bûn ew di rê de meşîn. Çiqasî meşîn çûn ew jî dibê ku ew ne di farqê de bin. Wê di wê demê de wê, dema ku ew gihiştin ber nehiyek ku ew nêzî cihê ku ew male wan lê bê wê, roj li ser serê wan bilind bê. têhna rojê pirr zêde bi germî êdî xwe dida dîyarkirin. Êdî dilopên xwehdanê xwe bi laşê wan re hêdî hêdî weke ku xwe dikirin ku ew berdîn xwerê. Lê ku wê zêde bûba germ di nava rojê de wê, bi zêdeyî wê, germehiyek zûwa wê li wan bûba. Lê di dema ku ew di çûn û di nava kêferatekê ban wê hingê wê, xwehdan wê bi wan re wê bûba. Ew jî di rê de pirr zêde diçûn û ber vê yekê laşê wan zêde germ û weke xwehdida.

Piştî ne bi gelekî re wê, Sêda wê bi birayên xwe re wê bigihijina malê. Dema ku ew gihiştina malê wî dît ku wê li ser serdora malê wê keç û kûrê wî disekin in û wê bi ber wan ve dînerin. Xanima wî Rênazê jî ew li hûndûr bû. Dibê ku ew bi karekê ve mijul bû. Hingê zaroyên wî ku ew dîtî ew di cih de kirin ku ew werina xwarê bi ber wan ve herin. Di wê demê de wê, wê ne bi gelekî re ku ew gihiştin ber nêzî devê dêrî wê zaro wan li ber devê dêrî ê aliyê derve wê pêşwazî bikin.

Sêda rahiştî wan bi herdû milên xwe û bi wan re çû hûndir. Kanan û Merwan li pay wî bûn. Bi hevdû re çûn û hundir û berî ku ew bikevina hundirê malê de wê li ber devê dêrî wê Rênaz wan pêşwazî bikê. Wê

hingê bi dengê nimz û kin gotina ku wê ji derkeve wê ew bê ku 'hun bixêr hatin', hun dûhû li kûdeverê man. Me mereqe we kir.

Sêda bersiv da Rênazê û got em dereng man li lê nêçîrê. Piştî em mecbûr man ku em cihê ji xwe re bibînin û li wir bimênin. Piştî wê em li wir man di şevê de. Dibê ku ew ne ewla ba ku em di wê demê de bi rêketiba. Ber vê yekê em man. 'piştî wê gotinê wê, Rênaz wê ti pirs û gotinên wê ji wan nekê û nebêjê. Wê tenê wê bê deng wê bimênê. Di dewama wê de wê, bi hevdû re wê, herina hundir û wê, bi hevdû re wê li dêwanek rûniştinê wê bi hevdû re wê rûnihin. Di wê devera ku ew lê rûniştin wê hinek jinên din jî wê ji malê wê li wir rûniştî bin. Piştî ku Rênazê bi destê ji wan re tiştina xwarinê amedekirin û hanî ber wan ew jî hat û li cem wan rûnişt. Di nava wan de ti fihêti nebû. Ew ahlên malekê bûn û lev serdest bûn.

Piştî wan dest û rûyê şîştin û li ser sofraya xwe rûniştin. Dem bi dem jî wê deng ji wan derkeve û wê bi hevdû re wê biaxifin. Di axiftinê de wê, Sêda û kanan wê zêdetirî wê deng ji wan derkeve. Car bi car Rênaz jî wê gotinna kin bibêjê. Lê Merwan wê tenê wê weke ciwanekê piçûk ê malê wê bêdeng wê bimênê. Deng ji wî dervediket.

Sêda hinekî bi kêfxweş û şahî bû. Wî li xwe dinerî. Lê kêfa xwe dinerî. Di her demên weke şahiyên ên weke newrozên de wê, ew hertimî wê li pêş ba bi tifratiya xwe. Wê dema ku ew di hat malê jî wê, ji aliyê jina wî ve wê, weke mirovek nazdar wê biheta pêşwazîkirin û wê, lê bînerîya.

Xewn dîtina Zembîlfiros

Dem hinekî din têve çû û Sêda û Kanan bibahsa nêçîrên xwe kirin. Piştî ku ew demek dirêj axiftin piştî xwe vekişandin li xwe rehetkirinê. Piştî xwe dana balgihekê bilind û li rehetiya xwe nerîn. Di wê temenê de wê, di awayekê de wê, ew wê, piştî wê serê xwe dênin.

Demek xweş û dilxweş wan derbaskiribû. Piştî wê, kanan û Merwan jî wê, xwe vekişênin li odayna xwe ku ew di wê de razihin. Sêda bi zaro û xanima xwe re piştî ne bi gelekî re bi tenê ma. Di wê demê de wê, ew jî wê, di wê demê de wê hinekî bi hevdû henekan wê bikin û wê, kêfxweşîya xwe wê bi hevdû wê derbas bikin. Di wê demê de zaro bi hevdû re mijul bûn. Hinekî dayika wan bi wan ve alaquadar bû. Piştî ew bi hevdû re mijul bûn û dayika wan bidest alaqa nîşandina li bavê wan da. Di ber dilê wî re diçû.

Wusa demek xwe ya dirêj bi hevdû re derbas kirin. Sêda weke ku ew hinekî wastahî dihat dîtin. Ber vê yekê Rênazê xanima wî ji wî re got ku

´ez zaroyan darxim ji odayê tu hinekî li çavê xwe rehet bikê´. Wî jî ji wê re ne got na û piştre wusa kir. Dayikê bo ku ew zaroyan ji odayê bibê wê ji wan re got.

-Dê ka zarokno werin ez ji were çîrokekê bêjim.

-Dayê çîroka çîya tê ji me re bêjê.

-Çîrokek pîr **xweş** a. Çîroka muxurzar û cihê pîroz **ardwarê** bê.

-Nûha ne nivê rojê ya, ma hê nebûya dema razana ku tu ji me re bêjê.

Piştî ku Zarokan wusa got ew jî ma sekinê. Ber ku wê hertimî di demên razana de wê çîrokên weke yên ´çîrokên keçelok´, çîroka şahmaran û hwd weke wan gelek çîrok ji wan re digot. Wê demê wan xwe bi wê re hertimî amede dikir. Wê di çîrokên xwe de wê çî pêjn û qarakter bûba wan dizanî. Ew li wê serwaxt bûn. Di her dema razanê a şevê de wê, ji wan re wê çîrokek bigota. Zarok bi wê rengê wê, mazin bûban. Di wê demê de wê, dê û bav wê weke fêrker û mamosteyên zaroyan ban.

Lê çendî ku zaroyan ew gotin gotibû jî hişê wan li ser dayika wan bû. Berê Dayika wan ew çîrok hinekî ji wan gotibû û dema ku wê xewa wan werê wê ew dinivî de birrî bû pû piştre ji wan re gotibû ´ezê dewama wê piştre ji were şevêka din vebêjim.´ Piştî wê re wê, demê dema ku zaroyan ew dîya xwe bihîstibûn hingî ew hatibû bîra wan di wê demê de. Dibê ku dayika wan ji wan re wê dewama wê werênê û ew jî li wê bihişênin.

Piştî ku ew ji odayê çûbûn û wan Sêda bi tenê hiştibû êdî Sêda jî çavên xwe miçkiribûn. Wî piştî ku wî çavên xwe miçkiribûn ew di cih de di xewê ve çûbû. Ew bi tenê di odaya xwe de razahî mabû. Ji xwe ew pîr zêde dihizirî. Di wê dema ku ew li nêçîrê bû rewşek din jî ku wê bandûrê li wê bikê wê bibê. Wê demê wî xezalek birindarkiribû û çûbû ber serê wê, ku ew kêra xwe biavêjê li sûkra wê û wê bigûrênê. Lê di wê demê de wê xezalek din weke dayika wê were û bi sêda re wê çav bi çav wê were û wê weke ji wî re bêjê wê xezalê ne kûjê bi wî bide **hîskirin**. Ew jî jî di wê demê de ji hişê wî ne çûbû. Di wê demê de ew li wê dihizirî´. Wî di xwest ku ew xwe ji wê rewşê jî bigihênê li manayekê. Piştre ew demek dirêj di xewê de dimênê. Rênaz jî wê bi zaroyên xwe re wê, di deverek din a malê wê li hev rûnihê û wê bi wan re wê tiştê bikê. Wê zarok qanix kiribûn ku ew tiştê din ji wan re bêjê. Wê çîroka xwe ya ku wê ji zaroyan re bigota bi wan dabû hiştin li şevê li dema razana. Êdî wan doz li wê nekiribû ku ew wê ji wan re bîrê ser ziman. Ew ji wan re wê vebêjê. ...

Piştî ku ew hinekî bi hevdû re dema xwe derbas dikin wê, weke ku wê, dengê wê were gûhê Rênazê. Ew deng jî wê weke ji devera ku wê Sêda

xwe li wê dirêjiribû û ew li wir di xewê ve çûbû weke ku ew ji wir hat. Pêşî wê weke alaqa ji wê nehanî. Lê wê êdî mereqe xwe ne şikand û piştre wê, gota zarokan “zarokno kan hun hinekî li vir li bendî min bin. Ezê herim odaya bavê we û werim. Dengê weke ku ji wir hat gûhê min. Dibê ku ew rabûbê.” Zaroka got ‘bila yadê’ û ew çû. Dema ku ew hat û wê devê dêrî vekir û ket hundûr de wê dît ku we Sêda nêvî çav vekirî û xewî wê weke xwe li ser tihêla xwe girtî û wê zû bi zûr bêhnê bide û bistênê. Hingê Rênazê fahmkir ku ew bi tiştekê ketiya. Wê piştr gavên xwe lezkir û bi çend gavan piştre xwe li rexê din ê Sêda da rûnandin û destê xwe danî ser milê wî û gotiyê de ‘çû bû nazdarê min.’

Sêda pêşî bêhnek dirêj ma sekinî û wî bersiv neda wê. Lê piştre wê weke demekê wê berê rûyê xwe li wê vegeerênê û wê li wê binerê. Li nava çavên wê nerî û weke ku ew li tiştekê bihizirê û bi ponijê nerî. Di wê demê de wê Rênazê wê fahmbikê. Wê piştre ku Sêda bi tememî hat xwe ew rast ser xwe rûnişt û pişta xwe da balgih. Rênazê di cih de avek ji wî re hanî û wî ew vexwart. Piştre li cem sekinî û li bendê Sêda û axiftina wê ma ku çû bû.

Sêda pêşî weke ku ew ne bi niyet bû ku ew biafirê. Lê piştre wî. Dema ku wî li rûyê Rênazê nerî ku ew li bendê axiftina wî ya û ew ne wusa disekinê ku ew dev ji wî berdê êdî wî jî biryara axiftinê di serê xwe de da û ji wê re bidest axiftinê kir.

-Naza min, delala min, min xewnek wusa dît ku ez ji ter bêjim, tê bê qey ew bi tememî li jîyanê rast bûya.

-Tê çî dît wilqasî tu dibin bandûra wê de mayî?

-Min dît ku ew di rewşek xirab de bûm carekê dimirîm. Carek din ez di nava kêfşxweşyê de bûm Piştre min dît ku ez weke li ber cihekê ku ez li wir dihatim lêpirsîn ji berkirinên.

-Xwûdê kêr kê. Te xewnek acêb dîtîya. Gelo ew nîşanaka wê çî ya.

-Ez nizanim. Lê hîs û hêsta mirinê pîr xort min girt. Ez mirim û mirim û dîsa zindî bûm.

Sêda çî di xewna xwe de dît ji wê re got. Dema ku wê axiftina xwe dikir jî weke ku ew bêhna zû diçû û dihat. Di wê rengê de wê, di rewşekê de wî xwe girt. Carna jî wusa di bin bandûra wê de bû wî, gotinîn wî ji devê wî dervediketin. Ew wusa di cihê xwe de dima sekinê. Êdî weke ku ew Sêda çûbû û li cihê wî yekî din hatibû. Wusa lê hatibû.

Dem hinekî din têveçû û Sêda li bendê bû ku ew were li xwe. Lê her ku ewdem têve diçû weke ku ew zêdetir weke ku ew taya mirinê bigrê lê dihat. Weke ku ew ta bigirê laşê wî xwehdana cemidî dide li der. Ew di

cihê xwe de dima sekinî û hema tenê di hizirî li ya li serê xwe. Ew demek dirêj di serê xwe de hizirkir û piştire wê, rojê heta roja din ew wusa di xwe de mabû sekinî. Weke ku ew li xwe hatibû girtin. Weke ku wê di xwe de hemû derî li derve girtibûn lê hatibû. Birayên wî hatibûbûna cem wî û xwestibûn ku Sêda werênina li sêra berê. Lê ew Sêda'yê berê nema bû. Ew çûbû û yekê din hatibû li dewesê. Wusa lê hatibû. Wê demê Sêda du rojan li malê ma û derneket. Ti carî wusa lê ne hatibû. Lê wê demê wê çî bikira ne dizanî. Piştire demek dirêj hizirkir. Piştî wê demê ku wê hinekî din bi ser ve bûhûrand weke ku ew hinekî hat li xwe. Lê hê jî weke ku ne bi tememî li xwe bû.

Demek din jî têve çû. Piştire ew di serê xwe de li wê dihizirê û biryarê dide ku ew herê bi yekê wê bişwirê. Di wê demê de wê, dema ku ew dihizirê wê, di wê demê de wê, xewna xwe ji birayê kanan re jî wê vebêjê. Piştire jî wê, Birayê wî heman şîretê wê lê bikê ku ew herê û bi yekê zane ku ew ji wê fahmbikê bişêwirê.

Piştire wî wusa kir. Di wê demê de wê, kesekê hesinkar ku ew hertimî wê weke ku ew zembilan ji sifirê çê dikin ew nas dikir. Gelek caran jî Sêda ku ew ji nêçîrê dihat wî tiştêk ji xwe li cem wî ji wî re dihişt. Wê demê ew çû cem wî weke keleşakî dimeşî. Heta dem wî cihê kargeha wî çû. Li vir demek dirêj ma sekinî Derwêşê ku ew di wê de kar dikir kesekê rih sipî, pîroz û çeng stûr bû. Weke ku ew li xwe bû. Hingî wê çakuç hajandibû çendî wî gelek stûr bûbûn. Sêda hat û li wir weke ku ew hinek ji wî re bêjin sekinî û li pêşîya û li wî nerî. Derwêş bakiriyê û ew xwest ku ew were hundûr û hinekî rûnihê. Di wê demê de wî jî ew ne şikand û ew û cem wê hinekî rûnişt. Di wê demê de wê, derwêş bi dengê nimz û kédika gotiyê weke ku te î ro ne nêçîr kiriya, te xwe nêçîr kiriya. Sêda hinekî ma sekinî û lê nerî. Piştire jê pirsî ku ew gotina wê tê çî manayê. Wî jî ji wî re vegot ku wî çî bi gotina xwe xwest ku ew ji wî re vebêjê.

Derwêş bi nerîn, ziman û dengê xweş ku wê mirov ti carî nikaribê li dijî wê gotinekê bêjê wî gotina xwe got. Wê di wê demê de wê ew gotinên derwêş wê wusa li xoşa Sêda wê herin wê weke ku wê hinekî wî werênina li xwe. Wê weke ku wê ji wî re wê bina derman di wê kêlîkê de.

Piştî ku Sêda li wê hisand û wî gotinên wî fahmkirin êdî wî jî ya di serê xwe de ji wî re got. Wî xewna xwe ji wî re hanî ser ziman û wî got. Piştî ku wî got ew di aslê xwe de ne li bendê bû ku derwêş wê gotinna li ser xewna wî ji wî re bêjê. Lê piştî ku Sêda gotinên xwe bi dawî kirin êdî

derwêş li ber wî sekinî û li nava çavên wî nerî û ji wî re bidest axiftinê kir.

-Ji gotinên xwe çî tê fahmkirin, û xwûdê bi wê xewnê çî peyama xwestiya bide zelal a. Ji wê tê fahmkirin ku tu ahlê xwûdê yî. Wê zaniba.

-Çî ji xewna min tê fahmkirin? Ka wê ji min re bêjê. Tê çî fahmkir?

-Min çî fahmkir ew ne muhîm a. Ya muhîm ew a ku te çî ji wê girt. Wê di dewama wê de wê, hê tiştên ku wê derkevina ber te wê bibin.

-Min ti tişt ji gotinên xwe fahm nekir. Deka hinekî ji min re bi zelalî bêje.

-Ya zelal ew a ku te gelek nêçîr kir û xwûn rijand. Te gelek can hildan.

Ev gotina derwêş weke ku ew li xoşa Sêda neçû. Wî hinekî rûyê xwe qimiçand û poza hanî xwerê. Derwêş ji wê rewşa wî ew baş fahmkir ku ew li xoşa wî neçû. Piştî xwest ku ew hinek gotinên din bi ser gotinên xwe yên ku wî ji wî re kirina bikê.

-Ez wê bêjim ji ter ku tu ahlê xwûdê yî. Xwûdê te ji hemû belayan biparêzê. Rêya mazinbûnê li ser doşekê bi rûniştinê re derbas nabê. Ew hinekî di tahbê re derbas dibê.

Bi wê gotinê re weke ku Derwêş ya ku wî gotî ew hinekî ji aliyê Sêda ve hatibû fahmkirin. Lê wî xwe girt û di wê demê de çî hizir û fikir hatina serê wî jî wî ew ji wî re di wê demê de xwe amede nedît ku ew ji wan werênê ser ziman. Ew ma sekin di rewşek bi hazn de. Wusa di rewşa xwe ma sekinê. Piştî ew weke qaderek din jî li wir dimênê û piştî di rabê û diçê ku ew vegehî herê malê. Wê xwe di wê hal û rewşê de ne di dît ku ew herê û bi hinek kesên din re hevdiştinê bikê û bi wan re rûniştinê û di dilxweşiyê de xwe bide nişandin. Piştî ew vegehîya li malê. Di wê dema vegehîna de ew dema ku ew dihat malê ew bi hazn bû. Nizanî bû ku ew çawa dimeşî. Ku ew hat malê wê di wê demê de wê, di rê de wê bigihijê birayê xwe Kanan û wê ew wê bi wî re wê, bidest meşînê bikê. Kanan fahmdikir ku Sêda di serê xwe de bi tiştîna ve meşkul a. Lê wî ew ne xwest ku ew di wê demê de wê ji wê derxê. Ma sekinî û li bendî wî ma ku ew gotinekê weke birayê mazin bêjê û piştî ew dewama wê werênê piştî wî. Çendî ku Kanan ma sekinî li bendî wî, ew bêdeng bû û deng jê dernediket. Dengê wî di xwe de mabû sekinî. Hinekî din jî ew di wê rewşê de weke ku ew ma sekinê. Berî ku ew bigihijina malê Kanan xwe amede kir ku ew gotinekê bêjê û wê bêdengîya Sêda bi wî re bişikênê.

Ew hinekî din hatin û gihiştin ber devê deriyê hawşa malê. Ber ku ew bigihijina ber devê dêrî û di dêrî re derbas bibin Kanan xwe zêde êdî negirt bidest axiftinê kir.

-Keko me em î ro herina nêçîrê. Weke ku tu ne di wê hewayê de yî.

Dengê Kanan çûbû Sêda lê Sêda weke ku ew hinekirî mabû bêdeng û deng dernexistibû. Lê weke ku ji xwe wî deng nekirî tevgerîya bû. Di wê rewşê de Kanan weke ku gek gûmanê ku wî dengê wî kir û ankû nekir. Çima wî bersiv neda wî? Ew di serê Kanan de bû weke pirsekê. Lê Kanan fahmkir ku tiştê di Sêda de heya. Ber vê yekê wî li şûna ku ew israr bikê wî xwe li bayî wê berda û bêdengkir û bi wî re meşî.

Ku gihiştina ber devê dêrî ku ew ji dêrî derbas bibin Sêda serê xwe rakir û li rûyê Kanan nerî weke ku ew ji wî re bêjê min dengê te kir. Min hiskir te çi got. Lê ew tenê weke bi awirek bû. Wekî din ti tişt bi gotinê ji devê Sêda derneket. Kanan piştî wê gotinê di serê wî de du hizir afirin. Yek ew bû ku ew dubare bipirrsê ku ew wê herina nêçîrê û ankû na. Hizra din jî ew bû ku ew bipirsê ku ma çi ya di serê wî de ew wî wilqasî li ser wê dihizirê û wî di dûnyayê dibê dûnyeyek din. Lê Kanan di nava wê hizirkirinê de di serê xwe de bi wî re meşî. Lê wê tenê yek jî ji wan ne got, ne pirsî. Wî xwe li rewşê berda û wusa çûna hundirê. Piştî ku ew çûna hindûr ew pêşî ji aliyê Rênazêa wî ve hat pêşwazî kirin. Piştî ew bi hevdu re bûhûrtina li devera ku ew wê li wê rûnihin.

Kanan heya wî tenê li ser Sêda bû. Ew ji nerîn û çavê Rênazê ne ravî. Lê wê ti tişt ne got. Di serê Rênazê de hinek hizir hebûn ku ew bi mihtemeli ew ber çi wusa bi hizira. Lê wê hizirkir ku ew dibê ku ew dema ku ew li derve ya dibê ku wî tiştina din bihîstin û ew li ser wê dihizirê û yan jî hineka tiştina din ji wî re gotina. Ber vê yekê wê jî zêde weke alaqa lê neda nîşandin. Tenê bi awirna nazdar û xweşik lê nerî û bi rûgeşî û rûkenî lê nerî. Tenê ya ku heya Sêda kişand li ser xwe di wê kêlikê de ew rûgeşî û rûkenîya li ser Rênazê bû. Lê wî tenê bi li wê nerînê re bi sînor xwe hişt.

Piştî ku ew hinekî rûniştin Kanan xwe ne girt û cardin hewl da ku ew bi wî re biaxifê. Di wê temenê de wî bala xwe da ser Sêda û ji wî re bidest axift:

-Keko heya te li min a. Ev demek weke keleşa li te hatîya. Di rê de tu gelekî bi hazn bûyî. Nûha jî du bi heman rengî bi haznî. Hinekan tiştê ji ter gotîya. Sedema wê hazn û ji xwe çûna te çi ya bira., keko.

Piştî wê Gotinê Sêda xwe li xwe hanî hevdu û pêşî li dora xwe nerî, û piştî bide axiftinê ji wî re kir û weha ji wê re hanî ser ziman:

-Keko çi ji te veşêrêm lê nikarim ji xwûdê veşêrêm. Ev demek bû ku ez dihazînim. Dûhû dema ku ez ji nêçîrê hatin me xwe li vir dirêj kir û min xewnek wilo dît ku ez gelek di bin bandûra wê de mam. Piştî ez çûm

dem derwêşêk hesinkar ku min û wî berê silev dida hevdû em bi hevdû re axiftin û min ji wî re jî vekir û wî ji min re hanî ser ziman ku ew weke nîşanayek ji rabê min a ji min re.

-Weke nîşanaya çiya keko, xwûdê xêrkê. ..

-Wusa tiştêkê zelal ji min re ne got. Lê tişta ku min ji wî û ji hizirikirinên xwe yên di serê xwe de fahmkir wê, hêsta mirinê kir serê min. Ez bi aliyekê din ve weke li xwe dema şiyarkirin. Heta nûha me ti tişt ji nefse xwe kêr nekir. Em mirovna bi nafs bûn. Mirov bi nafs ti tişt ji nefse xwe kêr nakê. Me jî ne dikir. Me hemû tişt kir kir û pêkhanî. Lê ev dûnya heya û dûnya din jî heya. Wê ew hanî bîra min.

-Kanan weke xwest ku ew hinek tiştên din jî bi wî re biaxifê. Hinek pirs di serê wî de afirî bûn. Lê wî di wê demê de wê biryar neda ku ew wan pirsên xwe bikê û ankû hinekî din bimênê. Di wê temenê de wî piştre xwe girt û ew hinekî ma sekinî. Lê Sêda piştre wî bidest axiftinê kir. Piştî kû wî ya serê xwe hemû ji Kanan re got piştre ew hinekî din weke xwe hat. Kanan bo ku ew hinekî din wî li xwe werênê wî, got Sêda “dêka em rabin û tîrûkavên xwe bidina pişta xwe û vê carê em li haspên xwe sîwar bin û herina nêçîrê. Sêda weke ku ew hinekî li wê xwestekê weke bêdilî bû. Lê ji wî jî ne hat ku ew bêjê Kanan na. Ber vê yekê ew hinekî ma sekinî û piştre wî ew xwesteka kanan weke rast dît û wî jî got Kana ‘dê hedê em herin hinekî nêçîrê bikin.’ Dema ku wî wusa digot jî laşê di giraniyekê de rabû ser xwe. Weke ku laşê ne dixwest ku ew herê wê nêçîrê. Wusa wî di xwe de hîskir. Lê wî bi hêstek li berxwedanê wî ew kir û ew rabû ser xwe.

Kanan bo ku ew were ser xwe û li xwe wî ew xwestibû ji wî. Ne xwe merame wî ne ew bû ku ew herin deverêk dîr û nêçîrê bikin. Wî xwestibû ku Sêda hinekî bi wê werênê li xwe. Piştre ew rabûna xwe xwe û bi hevdû re xwe amedekirin û li haspên xwe yên boz sîwar bûn û dana bazdanê û bi hevdû re bi ber çolên beyer de çûn. Demek dirêj bi rê çûn. Heta ku haspên wan hinekî weke ku wastîyan ew li ser pişta hasp û hasp dana bazdanê. Piştre ku ew hatina deverêkê weke ku wê li wê şênî li wê hebin û weke çolemergeke ku wê deverên ku weke koz û cihên mirovan ku ew li wê kom bibin ku ew li wê hebû li wir hinekî sekin in. Hinekî li keviya çolemerge avake diherikî û ew weke şaqekê avê ku ew bi dirêjîya xwe dirêjî ava diclê dibû bû. Li aliyên din avê weke deverna bi mal hebûn. Lê Sêda û Kanan bi haspên xwe bi ber wan deverên bi mal ve neçûn. Wan xwest ew di ber wan ve herin. Wan jî wusa kir.

Ku ew bi wê rengê hinekî meşîn ew hatina dahma devere ku ew li wê şênî hena û hinekî li wir hêdîka çûn. Li wir devereke weke zîyeretekê hebû û ew zîyeret weke ya mişahîxekê bû. Lê dar hebûn û weke bi darê ve gelek tarişên ji paçan ku ew reng bi reng bûn bi wê ve hatibûna girêdayî dihat dîtîn. Di wê demê de wê, weke ku deng werina gûhê Sêda lê dihê. Sêda hingî li dora xwe meyizend lê ti kesek weke li dorê nebû ji Kanan ve. Kanan jî ne di wê rewşê de dihat dîtîn ku ew bigotin bê. Deng ji wî dervediket. Wê demê kê deng kir. Di wê demê de wê weke ku wê kesek wê were û li ber wî bisekinê. Kesekê rihsipi û weke pîrr zêde pîr bû. Sêda û Kanan li ber wî paya bûn û bi wî re hinekî sekin in û şikêrek li pêşîya wan ku ew hebû li keviya wê şikêrê ew hinekî bi hevdû re rûniştin û mirovê kal ji wan bideest pirsînê kir ku ew wê çina kûdeverê. Sêda bersiv da û ji wî re got ku wê herina nêçîrê. Mirovê kal weke ku ew bi dersekê bide wî gotinên xwe bi wê rengê got “bihêlên bila ew jî bijîn. Ma nêçîr ne beş a êdî.?’ Bi wê gotinê re Sêda mafê gotinê girt û jê pirsî ‘ma te bo çi ev got.’ Dema ku Sêda wusa got Mirovê kal li Sêda nerî û jêre got li pêşîya binerê. Ku Sêda weke wî nerî weke ku wê gelek hastûyên sawalan wê li ser hevdû hatin danîn wê werina dîtîn. Lê ji dûr ve weke hastûyên mirovan dihatina dîtîn. Wê pîrr zêde bala Sêda kişand. Piştê Sêda dema ku ew li wê dinerî wê di wê demê de wê kir ku ew rûyê xwe li mirovê kal bi zivirênê û bi wî re biaxifê û lê mirovê kal weke ku ew ji berçav windabûbû. Piştê awirên acêb, şaş û matmayî berê xwe da Kanan û li wî nerî û ji wê re pirsî ku ‘ka mirovê kal’. Dema ku Kanan çî mirovê kal keko’ û ma sekinî Piştê ne gotin ji devê kanan û ne ji jî devê Sêda derket. Sêda di wê rewşê de wê weke ku wî ya ku wî fahmkirî wê fahmkiribê bi nerînekê li kanan nerî û gotîyê de:

-keko em nûha vegeirihina malê.

-Ne em nûha hatibûn. Hê em ne çûna deverenê nêçîrê jî. Ka meyê nêçîr kiriba.

Lê Sêda tenê bi gotina “em vegeirihina malê” bersiv da û ma sekinî. Kanan zêde ti tişt ji wî re ne got. Ew tenê ma sekinî. Piştê ew dîsa li haspên xwe sêwar bûn û bi rengê bêserî hasp dana bazdanê û hatina bi ber malê ve. Kanan ti tişt ji wê rewşa Sêda fahmnekiribû. Ew pîrr xarîb tevdiageriya. Ku ew hatina malê wê di rê de wê li ti deverê wê ne sekin û heta ku ew werina malê. Haspê wan weke rêya xwe dizanî wan ew li ser piştê xwe dihanî malê. Di wê rengê de wê, di rewşek bi wê rengê de ew hatina malê. Piştî ku ew gihiştina malê di cih de ew ji haspên xwe payabûn û hewsarê hasp bi devereke weke çengil ve girêdan û ew

bûhûrtina li hundir. Kanan li pay Sêda bi hevdû re hatina hundûr û li hundûr li hevdû rûniştin. Kanan dixwest bipirsê ka çi bû. Lê wî xwe girt û li bendê bû ku Sêda ew bi çend gotina vebêjê ku ew çi dît û çima wusa kir. Piştî ku ew weke demekê weke bêhna xwe berdan piştre Sêda berê xwe da Kanan û ji wî re bidest axiftinê kir.

-keko, ev çendeke weke ez xilubatan dibînim. Min ki xewna xwe û ya ku min dît min payame ku ez bigirim min girt. Êdî ji min re tewbe ku ez di rêya rastîyê û baş de herim û ez xwe ji qanciyê dûr nekim. Êdî ne mirov û ne jî ti zindiyek êşê ji destê min ne kişênê. Ez wê sozê ji xwe re bidim.

-Keko me te çi dît.?

-Min rastî dît. Min dît ku rêya rastiyê di kûve diçê.

Ev gotinên Sêda ji Kanan re weke zêde bi wate ne dihatin. Wî zêde ti wate ne dida wan di wê heyamê de. Lê wî ti gotin jî li hemberê wan bi lêv nekir.

Piştire wusa demek derbas bû û Sêda û Kanan hinekî din li hevdû rûniştin man û bi hevdû re axiftin. Ya wan jî ne digot axiftin. Tenê dibû li hevdû rûniştin di bêdengiyekê de. Di wê rewşê de wan dema xwe wusa derbas kir û mana sekinê. Lê Sêda biryara xwe dabû ku ew êdî rengê jîyane xwe bi gûharênê. Ji wê jîyane ku ew di nava zewk û sefayê de dijî ew ji wê dûrkeve. Ew rûyê din ê jîyanê bibînê û bijî. Di wê rewşê de ew bi wê rengê wê weke ku di mejiyê xwe de wê dihizirê. Wî ew hizirên xwe ji birayê xwe Kanan re jî vegot. Kanan weke ku ew fahmkir û tevgerîya û bi gotina "keko tu çi bikê û çawa bijî, tu birayê meyî û heta mirinê em li pay tenê na." Wusa got û ma sekinê. Rênazê di wê dema ku ew bi hevdû re diaxiftin ew jî li aliyê din ê odayê wê dengê wan dikir û wê bihîst ku ew di axiftin. Piştî ku Kanan çû û Sêda bi tenê ma di rewşa xwe de ew hat li ber çûkên Sêda rûnişt û li nava çavên wî nerî.

Rênazê weke ku ew ji wî re bêjê ku wê hemû gotinên wî bihîstin li aliyê din ê odayê li nava çavên wî nerî. Sêda weke ku ew di xwe dûr bû û dûrketibû. Weke ku ew hişê wî ne li wir bi wî re bê wî dinerê. Piştire ew weke ku ew were xwe lê hat û wî berê xwe da Rênaza xwe û hizirên xwe ji wê re vegot û hanî ser ziman. Di wê demê de Rênazê hemû tiştên ku wî ji wê re vegot lê hisand û heta ku wî gotina xwe bi dawî nekir jî wê deng nekir ku ew gotina wî di nêvî de bi birrê. Piştî Sêda gotina xwe bidawî kir wê, berê xwe da wî û rastarast li nava çavên wî nerî bi awirên bi xwe bawer û lê axift.

-Azîzê dilê min, malxwe male min û dilê min î. Heta mirinê ku cihê de kûder bê ez yê min ew der a. Hertimî cem te ya. Ku tu çawa bijî em jî wusa bijî. Helbet xwûdayê ku em dana wê rizqê me jî wê bide me. Wê li wê bihizirê. Ew ku di baxtê me de hebê emê wê bijî. Bayê felekê me bi kûve bide birin emê herin. Em li hemberê feleke xwe nasekin in. Em wê dilnexweş nakin.

Rênazê ev gotin gotin û ma sekinî. Sêda ji wê gotinê wê hem pirr kêfxweş bû û hem jî hinekî bi hazn bû. Di wê demê de wî di serê xwe xwe hizir ku wê, çi li pêşiya wan bê ew li wê hizirî û wî zêde nikarê pêbibînê ku wê çi wê were li pêşiya wan.

Di wê demê de wê, Sêda wê biryara ji male wî weke qasrê derketinê û hemû tiştê li xwe bihêlê bide. Di wê temenê de wê, ew êdî wê, bi wê re wê, herina deverê din ku wê li dora mayafarqînê weke malek piçûk bbi zaroyên xwe re wê barî wir bikin. Wê di wê demê de wê ardekê piçûk ku ew bo çandinê li pêşiya wê malka piçûk hebû. Sêda û Rênaz piştî ku ew tîn wir wê, çend sawalan jî wê ji xwe re peyde bikin bo şîrê wan jî zarokan re. Piştî ew tê cem derwêşê xwe ku ew derdê xwe û biryara xwe ji wî re jî dibêjê. Derwêş hinekî ji wê gotinên pirr bi dil dibê. Ew piştî dibêjîyê de 'ku tu wusa biryarek dabê wê demê tiştê ku ez jî ji ter bikim heya. Wê demê were bi min re kar bikê. Ne tu dizanê ku ez jî pîrbûma û nikarim hemû karê hesinkarîyê bikim. Tu zanê ku ez zembîlan çêdikim û ew pirr zêde giran in. Pêwîstîya bi alikariyekê heya.' Dema ku derwêş wusa got êdî Sêda ew bi dill û kêfxweşî pêşwazî kir û li cem wî dest bikara hesinkarîyê a bi çêkirina zembîlan kir. De ne, zembîl ne weke salikan bûn. Salix ji darik û şifan dihatina çêkirin. Lê **zembîl** ew bo xwarinên mazin bûn û ew ji sifirê dihat çêkirin. Ew jî pirr zêde giran bûn. Bi êgir û halandina sifirê û li hevdû bi lihêmkirinê û hwd re ew dibû.

Piştî Sêda dest û lingê xwe ji hemû tiştê û jîyane bi şatafat kişand û li cem derwêş bidest jîyankirinaka bi wê rengê kir. Wî jî bidest çêkirina zembîlan kir. Di wê demê de wê, di demek kort de wê Sêda wê di karê çêkirina zembîlan de wê, bi hûner bê. Wê di wê temenê de wê, ew wê zembîlan wê çêbikin û wê li piştî hasp biikin û wê dever bi dever wê li kurdistanê bigerênê ku ew wê bifiroş ê. Di wê temenê de wê, ew wê, di awayekê de wê, jîyane xwe û dabare xwe wê bikin. Sêda û malbate wî jîyane bi xizanî wê bi wê rengê wê êdî wê bijîn. Lê ew ji jîyankirinê wan ti gilehên wan nebûn. Bi hevdû re bi dilxweş û şa bûn. Wî wê rengê wê jîyane xwe wê bidina dimandin. Wê, di wê temenê de wê Sêda wê sibehê

wê ji malê wê derkeve herê kar û wê êvarî wê werê malê li nava zaroyên xwe.

Piştî ku ew êdî weke zembîlfiroş bû

Di wê demê de wê, birayên wî çend caran wê werina cem wî ku ew wî bi xwe re weke berê bibina nêçîrê û deverên din. Wan weke bîra wî kiribû. Lê wan çî kir û nekir ew nebirin bi xwe re. Sêda weke xwe ma. Wî di helwesta xwe ti tişt ne gûharand.

Sêda weke xoertekê levhatî, bedew û sipahî bîê. Herkesê ku ew didît wê bale wan dikişand. Di gotin ku xwûdê xweşikatiyek weke ya usif daya wî. Di wê rengê de wê, di nava xalkê de wê bişibihandin çîroka usif û zuleyha jî.

Sêda êdî ne weke sêda û ankû sîdar dihat nasîn. Ew weke kesekê ku ew zembîlan di firosê dihat dîtîn û nasîn. Ew bi wê rengê êdî ew hat nasîn di nava xalkê de. Di nava xwe de wê, ew wê, weke 'zembîlfiroş' wê êdî wê nav bide û wê were nasîn. Wê dema ku wê bakinê de wê bêjin 'zembîlfiroşo halo' 'zembîlfiroşo wilo'. Wê ew wusa bihata nasîn. Ew êdî bi nav û deng weke zembîlfiroş dihat nasîn. Her deverên ku ew diçûyê de wê, di wê rengê de wê, ew wê, bê dîtîn.

Wekî din jî wê ji aliyekê din ve jî ew pîrr zêde levhatî û sipahî bû. Gotinên weke "**zembîlfiroşê sipahî**", "zembîlfiroşê bedew", 'zembîlfiroşê xweşik' hwd re wê bê nasîn. Ew êdî zembîlfiroşek bû. Bi wê rengê ew dihat nasîn di nava xalkê de..

Roj li ser rojê û heyv li ser heyvê diçûn. Zembîlfiroş bi wê rengê dihat nasîn. Ew êdî weke kesek wusa bû. Wusa weke derwêşekê wê jîyane xwe wê bi wê rengê wê, bide domandin. Wê, di wê temenê de wê, wekî din zembîlfiroş wê bi rewîş û ankû axlaqê xwe jî wê bi başî û pîrr zêde qanc wê bê naskirin. Wê di wê rengê de wê, bale mirovan wê herkesê wî nasdikir wê were li ser wî.

Demek dirêj di wê ve diçê û ew jî bi wê rengê wê kar û xabatê wê bikê û wê nav wê bimê male li nava zaroyên xwe. Di wê temenê de wê, êdî ew bi wê rengê wusa dihat nasîn. Di nava malbate wî de tifaq, hêzkirin û qancî weke hertimî wê bi têkiliyên wan re wê hebûba. Rêz û hûrmet jî nava wan ti carî kêma nedibû. Bi wê rengê wê, bi gotinên qanc, û hevdû başdikkin û hêstek baş didina hevdû wê bi hevdû re wê bi axifin û wê gotinê wê jî hevdû re wê bêjin.

Sêda weke zembîlfiroş di nava xalkê de wê, bi gelek navan wê were nasîn. Weke navên ku wê heta roja me jî di nava xalkê de wê ew wê bi

wê werê nasîn navên weke “saîd” û ‘sehî’ jî wê were nasîn. Bi wê re lê wê ew li giştîya kurdistanê û herêmê wê weke zembîlfiroş wê bê nasîn. Wê navî wê derkeve. Herkesekê ew bi wê rengê nasdikir. Li rengê jîyane wî dinerîn û ew pêname dikirin. Di jîyane xwe de jî wê, weke kesekê xizan ku ew jina xwe û zarokên xwe bi hevdû re di malek piçûk de a xizan dijîn û tiştê di male wan de nîn a û heta ku cihên ser wan wê weke kevnîkên ku kesên din bin ku wê bi xêra xwe bidan wan êdî wan li xwe dikir.

Zembîlfiroş li Mayafarqînê

Sêda jî wê weke zembîlfiroş wê bajar bi bajar û gund bi gund wê bi gerîya û wê, zembîlên xwe wê bidan firotin. Ew weke karê wî bû. Ew bi wê dihat nasîn. Qazanca ku ew ji dikê wê bi wê jî wê jîyane xwe wê dabare wê bikê û wê li zaroyên xwe wê binerê. Di wê rewşê de wê, deverên weke mayafarqînê ku wê weke navendna kurdistanî ên wê demê bin wê ew jî wê, rêya wî bi navenda wê bikê. Ber ku wê bazarîyek mazin wê hertimî wê di nava wê de wê, hebê û wê, tişt ji gelek deveran wê werina wir bo firotinê. Ew jî wê, rojekê ji rojan ku ew li hewirdorê herêmê hema bêja hemûyî gerîyaya wê, rêya wî bi wir bikeve.

Wî ew dever nas dikir. Ji xwe ji wê herêmê bû. Ew di demên xwe yê berê ên ciwaniyê de rêya wî bi wir jî ketibû. Lê axlebê jî wê li dora botanê wê ew bijî. Ew malbate wî û malbate xatûna Rênaz xanimê jî ji malên mîran ên wê herêmê bin.

Dema ku ew dihê **mayafarqînê** wê di wê demê de wê, li wir wê li bazarê li deverekê wê cihekê li berçav wê ji xwe re wê bigirê û wê, tiştên xwe wê li wir dênê. Wê şanî kesan bide. Dibêjin ku wê di wê demê de wê, kesên weke ahlî qasrê wê di nava gel de digerîyan û di wê demê de wê, xayûna mîrê maya farqînê mîr **Hisên Gûlê xatûn** jî wê, ew jî wê di nava gel de wê ligel **qerwaşa** xwe wê, bigerihê.

Sêda wê pîrr zêde wê weke mirovekê xweşik û levhatî bê. gelek kesên ku wê, werina cem wî bi hênceta li tiştên wî binerin wê, weke ku wê tenê bo li wî binerin jî wê bihetan. Dema ku ew didîtin digotin sipahitîyek bi wê re dibêt ku ew berê nne hatibê ser rûyê ardê.

Sêda bi wê rengê bale herkesekê dikişand li ser xwe. Kesekê bi wê rengê levhatî û sipahî ma çawa ew di rewşek wusa de bê. Di wê heyemê de wê dema ku wê gelek mirov wê li dora wî bicivîn wê, xatûna mîr gûlê Xatûn jî wê qalabalixê wê bibînê wê ew jî wê bi kesên li dora xwe wê were nêzî wir. Yê bi wê re jî wê weke ew bi tiştêna ve ew xwe bi dora

xwe mijul dîkin wê bidîna nîşandin. Lê Gûlê xatûn wê, bi qerwaşa xwe re wê, bi ber wir wê herê. Qerwaşa wê, dema ku ew çavên wê bi Sêda ketibûn hema wusa bi çavna raq tenê li wî meyizendibû. Wê nerîna wê raq wê bala xatûna wê bikişênê û wê, ew jî wê bi aliyê ku ew binerê re wê binerê. Di wê demê de wê, ew jî wê çavên wê, bi Sêda bikeve û wê ji wî bibê bi heybet. Di wê demê de gotina ku wê ji nava lêvên wê sipahî wê derkevin wê ew bê ku 'hey xwûdê ew çî levhatîbûn a' bê.

Xatûnê çavên xwe ji wî negirtin. Wê weke ku hişê wê ji serê wê herê û ew di xiyalan de bimênê lê hat. Di heyemek piştê wê qerwaşa wê were li xwe. Wê dema ku ew dihê li xwe wê li xatûna xwe binerê ku ew bi nerînên pirr bi heybet ew li wî ciwanî dinerê. Ew kî ya û ne kî ya wan ne dizanî. Lê di wê demê de wê, heya xatûnê wê herê ser Sêda ankû zembîlfiroş.

Dem hinekî têve çû û xatûn jî wê weke demek dirêj wê li wir derbas bikin. Lê ew zêde nikariban biman. Ew xatûna mîr bû û hinek orfûadetên wê hebûn ku ew bi wan tevgerîya. Wê demê wê, piştê wê, di cih de wê dema ku ew hat wê xwe bi hêjenê û serê xwe bi şûn ve bide û wê aliyê fistanê wê qewre ku ew ser paşila wê girtbû wê destê xwe biavêjê wê û wê, weke ku wê hinekî wê bi xwerê ve bide.

Gûlê xatûnê wê pirr mereq kiribû ku ew kî bû. Ew zembîlfiroş kî bû. Ber wê yekê kiribû serê xwe de ku wî bibînê. Wê ew ji serê xwe dernedixist. Piştî ku ew hatina bi ber qasrê ve wê, gûlê Xatûnê serê xwe li qerwaşa xwe zivirand û ji wê re got 'tu here û binere ka ew zembîlfiroş kî ya wî fêr bibê û wî bi zembîlên wî re wî bîne qasrê cem min. Qerwaşê weke ku wê xatûna wê got wê jî got 'bila xatûna min . ' û di cih de ji cem wê vaqatîya û bi ber navê sûkê ve çû. De ne di wê demê de wê mayafarqîn wê, weke navendek berfireh bê. Wê, pirr zêde wê, civakek mazin wê li wê bijî. Ji gelek herêmên dora wê hertimî wê kes li wê bicivin. Ber vê yekê wê hertimî wê şev û roj wê dengê mirovan bi qalabalixî wê ji nava wê biheta. Wê, qalabalixek wê li wê hebûba.

Qerwaşê hat û rastûrast çû cem zembîlfiroş ku wê hê gelek kes wê li dora wî bi civîn wê hebin. Wê xwe gihan nêzî wî û destê xwe di nava gelek kesên li dorê de li milê wî da û bi wê bale wî kişand ser xwe û dema ku Sêda xwe li wê zivirand wê li wê bidest axiftinê kir:

-Zembîlfiroşû, dêka malê xwe lev bide hevdû û bi min re were qasrê. Xatûna min dixwezê ti bi malê xwe re were cem wê.

-Xatûna te kî ya xwûşkê?

-Xatûna min, nazdar, dilpak, xweşik û bi delaliya xwe ti kesek ser wê re ku wê nebê xatûna mîr Hisên mîrê mayafarqînê bê.

-Temam xwûşka hêja, xwesteka wê ser serê min. Ez nûha zembilên xwe bardikim û têm.

Dema ku Sêda wusa got wê êdî wê qerwaşê ew bi tenê hişt û hinekî wê bi xwe bi şûn ve dayê. Ber ku ew hê li dora wî gelek mirov hebûn û wê ne xwestibû ku ew di nava wanqas kesan de bisekinê.

Ji xwe, ew weke qerwaşê bi cil û bergên wê ên li wê di hat dîtîn û fahmkirin ku ew weke asîlzaneyekê dihat dîtîn. Piştî bi demekê ku wê, Sêda wê, kare çûyinê kir wê, qalabalixa li dorê jî wê weke ku wê bidest belevbûnê bikê. Ber ku wan fahmkir ku ew wê malê êdî bide hevdû û wê herê. Piştê ku wî malê xwe li hev da hevdû û avêt piştê xwe êdî wî berê xwe da bi ber aliyê qasrê ve. Lê dema ku wî berê xwe da bi qasrê ve wê çavên wî bi qerwaşê Gûlê Xatûnê dikeve weke ku ew hinekî ji wî wirdetir li bendî wî mabû hat dîtîn.

Sêda dema ku ew çavên wî bi wê dikeve wê, bi nerînek mahçûp wê li ber xwe binerê û piştê wê, bi ber wê ve wê bidest meşînê bikeve. Qerwaşê çavên xwe ji wî ne digirtin. Ew ji nerîna Sêda neravî. Ber vê yekê wî xwe di rewşek fihêt de hîskir. Di wê temenê de wê, heta ku ew ji wî dikat êdî wê di wê rewşê de dikir ku ew bi wê re çav bi çav newê.

Wusa hinekî li rex hevdû ku wê hinekî Qerwaş wê li pêşîya wî bimeşê bi ber qasrê çûn. Ku ew hatina berqasrê ji xwe êdî kifşbû ku ew hatina qasrê. Ber ku ew heybet û mazinahiya wê, ji her aliyê ve ew dihat dîtîn û fahmkirin.

Ew di derîyê pêşî ve ketina hundirê hewşa qasrê û di wê demê de wê, qerwaşê gavên xwe lezandin. Sêda ew fahmkir û dema ku wî dît ku wê gavên xwe lezandin wî jî bidest çûyina bi lez kir ku ew ji wê qût nebê. Wî wûsa hîskir ku ew hinekî din zûtir neçê ew ê ji ber çavên wî winda bibê û wê piştê wê nikaribê tiştekekê bikê di qasrê de. Ku kesek rastî wî were û jê re bêjê ber çî tu hatî hundirê qasrê jî wê ti bersivên wî ji wan re wê weke ku ew nebin. Ber vê yekê wî ne dixwest ku ew wê ji berçav dûr bikê û winda bikê.

Ew hinekî di nava qasrê de meşîn û çûna bi ber devera lê rûniştinê a bi malbatî. Gûlê xatûnê wê, ber ku ew werin ew hatibû malê û wê xwe nûkiribû. Fistanekê nû û xweştir li xwe kiribû û hinekî din li xwe meyizendibû. Gûlê Xatûn jî bi xweşikatiya xwe bi nav û deng dabû. Digotin ku ti xweşikati li ser xweşikatiya wê nebûn. Ew wusa bedew,

sipahî, delal û xweşik bû. Te digot ku wê xweşikatiya hemû jinan ji xwe di laşê xwe de lev daya hevdû.

Ku Sêda bi malên li milê wî re ket odaya ku ew li wê rûniştîya wê demê wî hizir nekir ku ew malê xwe dênê ardê. Wusa tenê li gûlê Xatûnê û endama wê nerî. Gûlê xatûnê bi nerînek pîrr zêde kûr û weke ku ew ji dûr ve binerê lê nerî. Sêda di destpêkê de wî ti wate û mana neda wê nerînê. Ber vê yekê wî tenê di wê demê de awirên xwe heta ku ew ji wî dihat wî dikir ku ew ji yên Gûlê Xatûnê ku ew yên wê hertimî li ser wî bûn bide ravandin. Ev ji bale Gûlê Xatûnê ne ravî. Ber vê yekê wê xwest ku ew xwe rehet hîsbikê. Ber vê yekê bi rehetî xwest tevbigirihê û wê kir ku ew çend gotinan bibêjê ji wî re. Gûlê Xatûnê ku wê qerwaşe wê li rex wê sekinîya wê, bidest afirinê li zembîlfiroş bikê.

-Tu bixêr hatî zembîlfiroşo. Ti kûderê û rêya ji kû bi vir ve ketîya.

-Xanima min, rêya ne ji deverek dûr bi vir ketîya. Ez jî ji dora wê herêmê ji aliyê nisêbînê bi ber vir ve hatima. Weke hatima vir gelek deverên din jî hatima. Te bi qerwaşe xwe bakira min û ez hatim. Kerem bike va ez û malê min. ..

-Min xwest ku ew te nasbikim. Te bale min kişand. Min heta nûha ti kesekê weke te bedew bale min wusa nekişandibû. Ez wusa zan nakim ku yekê weke te hatibê ser rûyê dînyê jî.

Li ber van gotinên ku weke methiye na, Sêda nizanî ku wê çi bêjê. Tenê ma sekinî bi nerîne mahçûp awirên xwe birina ser Gûlê Xatûn. Gûlê xatûn dema ku wê, ew awirên Sêda bi mahçûbî kifşkirin wê xwest ku ew rehetir tevbigirihê. Piştî Gûlê xatûnê cihê li rex xwe weke doşkek bilind û bi balgihna pîrr zêde xweşik ên naqşkirî û xamilandî ku ew hatibû adilandin û weke cihê rûniştina mîr dibat dîtin wê teliya xwe bi wir ve kir û got 'zembîlfiroşê awir mahçûp', meyizênê ev cihê mîr a, kerem li cihê wî rûniha.' Wê gotinê zêdetirî Sêda kir rewşek fihêtiyê û mahçûbiyetê. Nizanîbû ku ew çi bêjê û weke gotin ji nava lêvên xwe derhênê weke bersiv ji Gûlê xatûnê re.

Gûlê Xatûnê xwe adilandi bû. Piştî ku ew hatibû malê wê fistanekê din ê pîrr xweşik li xwe kiribû. Lê fistanê wê pîrr zêde tenik bû. Heta ku serê taximê memkên wê dihat kifşkirin di wê fistanê de.

Sêda wê, di wê demê de wê, demek dirêj wê, li ber Gûlê Xatûnê ma sekinî. Ew bi hêsta ku wê tişt weke zembîlan ji wî werina kirin ew hatibû. Lê ew rastî rewşek dîn hatibû. Gûlê xatûnê bi rengê alaqaçek li wî nîşan dida. Di wê rewşê de wê, Sêda heta ku ew ji wî hat wî xwe girt û xwe kir ku ew bi şûn ve bikişênê.

Dema ku gûlê Xatûnê teklif ji wî re kiribû û wê, herê nekiribû hinekî ew bi maraz bûbû. Wê dilê xwe girtibû û bi awirên hinekê zaxwedariya wî dinerî.

Lê Sêda di ya xwe de weke ku ew safî û zelal bû. Di wê temenê de ew di gotina xwe de bû. Piştî ku wê demek têve herê wê, Sêda weke ku hinekî wê nîyeta Gûlê xatûnê fahmkiribû. Gûlê xatûnê weke ku ew acibandi bû. Bi wê rengê ew li wî tevgerîya. Alaqa li wî nîşan dida. Gûlê xatûnê jineka bi mêr a mîrê mayafarqînê bû. Ew jî zewicî bû xwedî zarok û jineka ku wî hêjê dikir bû. Vêcar wê çawa wê, alaqaqayek li wê nîşan daba.

Dem hinekî têve çû û gûlê Xatûnê ji sêda xwest ku ew barê milê xwe dênê ardê û bi wî re were baxçeyê qasrê û bi wê re demê derbas bikê. Lê wî ew jî herê nekir. Di wê demê de wê, Qerwaşa wê li rex wê tenê wê li wan dinerî bi çavna baloq. Wê kîjan ew diaxif wê awirên xwe dibirina li ser wan.

Hinekî dem têve çû û Sêda piştî wî xwest ku ew herê ji cem Gûlê Xatûnê. Ber vê yekê wî dema ku wî kara xwe kir, Gûlê xatûnê bi awirekê ku wê da ser wî lê bidest axiftinê kir:

-Zembîlfiroşo tê çi kê? Ti dibê qey tu li ser êgir î.

-Xatûna min, ez benî, ez divê ku ez herim. Ez miroekê zewicî me û xwedî zaro me. Divê ku ez di dema xwe berî ku zêde bibê dereng bikevima rêya xwe de ku ez herim û bigihima male xwe.

Dema ku wî wusa got weke ku ew kevirekê li ser dilê Gûlê xatûnê bixê lê hat. Weke ku ew ne li bendê wê gotina 'ez miroekê zewicî me û xwedî zaro me' bû. Ber vê yekê ew hinekî ma sekinî. Lê Gûlê xatûnê wê piştî weke ku wê di ya xwe de wê israr kir. Wê, xwest ku ew li wir bimênê. Li cem wê bimênê. Gûlê Xatûnê rastarast ji wî re got ku 'ez bi dîtina te ya pîr delal pîr zêde kêfxweş im.' Wê gotinê kir ku Sêda hinekî din biaxifê li wê. Piştî Sêda hinekî ma sekinî û berê xwe da wê û got "xatûna gerden bi morî' xatûna delal û pak ku tu xweşikati li dunyayê li ser ya wê re neyî ez, mirovekê zewicî bi zaro û tobakar im. Bela xwe ji min veke. Min di halê min de bihêla. Ji zembîlfiroşekê weke min ti çi dixwezê. Dilê min jî ne ye min a. Ew aîdî xamina male min a.'

Bi wê gotinê û gotinên xwe yên berî û piştî wê re wê Gûlê xatûnê wê çi bêjê wê Sêda wê red bikê. Wê pîr zêde wê, di rewşek xirab dît û pîr aciz bû. Piştî wê, bi zimanekê hişk berê xwe da Sêda û gotiyê de ku ez xatûna wê qasrê me. Ez dikarim nûha canê te ji dest hildim.' Sêda li hemberê wê gotina weke tehdidekê bersiv da û gotiyê "rast a, tu karê

canê min hilde, ew canê xwûdê û ji wî pêve tiştekekê ku ez bidim nîn a. Piştî wê gotinê wê, Gûlê xatûnê bi awirekê hişk û zaxwedan berê xwe da qerwaşa xwe û got agahiyê bide nobadaran. Bila wir in û vî zembîlfiroşî di cih de bavêjina li zindanê.

Zembîlfiroş di zindanê de.

Piştî ku Gûlê xatûn ferman da qerwaşa xwe êdî ti tişt li ber wê fermana wê nesekinî û di cih de wê bi dengkirina qerweaşê çend nobadar hatin û bi çembilê sêda girtin û ew bi xwe re birina jêr li devera zindan li lê. Li wir ew girtin û avêtina hundirê.

Sêda ne dizanî ku wê çi bêjê. Lê çendî ku gûlê Xatûnê ew avêta zindanê jî ji ber ku wî ew redkir dilê wê jî di wê de pirr zêde bi wê kirina wê êşîya. Wê di wê demê de ew pirr zêde bi hêst û xam bû. Di xwe de weke ku ew bi hazn bûn. Qerwaşa wê nêzî wê bû û gotiyê de “xatûna mina delal û xweşik û bedew, te tiştekekê şaş û ne qanc nekiriya ku wilqasî bi hazn bibê. Tu çima miarazê xwe dikê. Çima rûyê te bi kul bû. Hazn ket ser hinarîkên rûyê te. Te rast kir.”

Lê gotinên qerwaşê ên ku wê kir ku ew bi wan dilê wê hinekê xweşik bikê û wê bîne li xwe weke ku ew ne gihîştibûn li armanca xwe. Wê hinekî wê, di wê demê de ew jî ma sekinê. Lê qerwaşa wê di wê demê de weke ku ew di serê xwe li hinek gotinên din ên xweşik bihizirê ku ew ji xatûna xwe re bêjê ew dihat dîtîn. Dema ku mirov li rûdana wê dinerî weke ku ew di xwe de kûr û dûr çûbû.

Dem hinekî din têve çû. Gûlê xatûn di wê demê de wê, hinekî din li odaye xwe ya teybet a rûniştê ku wê di wê de hertimî bi mîr re dem li wê derbas dikir ma. Ew weke odaya wan ya teybet bû û zêde ti kesek ne dihat wê odayê. Weke odaya mehremiyeta wan jî bû.

Gûlê xatûn di wê demê de ew bi tenê bû. Mîr ew demek bû ku ew çû hinekî gerînê li hewirdorê. Wî dem bi dem gerên bi wê rengê dikirin bo ku ew herêmê bibînê û kêmesîyên wan bibînê û bi wan re demê derbas bikê dikir. Di wê demê de jî ew li gerek xwe ya di wê rengê de bê.

Gûl Xatûnê wê di wê demê de wê zembîlfiroş ji aqilê xwe dernedixist. Ne dikarî wî ji aqilê xwe derxê. Ew çi kes bû û kesekê çawa bû ku ew dikarê gotinê li hemberî ya xatûneka weke ya gûlê xatûnê ku ew xatûnê mîrê mayafarqînê bê bêjê. Ew dibê ku ew ne kesekê ji jêrê bê. Ev hizir di serê wê de bûn û çêbûn.

Hinekî din dem têve çû. Di wê demê de wê, Gûlê xatûnê di aslê xwe de tiştekekê din derbas kir. Ew ya ku wê di serê xwe de wê derbaskirî ew bû

ku ew herê zindanê û di zindanê de bi wî re çav bi çav werê û bi wî re biaxifê. Lê di wê demê de wê, hinekî xwe girt û new nekir. Pêşî ew hizirî ku ew wê bikê wê ne rast bê. Lê piştî wê bîryara xwe da ku ew wê bikê. Piştî ku ew dihizirê ku ew wê bikê wê, di wê demê de wê, kare xwe bikê ku ew wê bikê. Dema ku ew kara dikê ku ew wê bikê wê, di wê demê de wê, qerwaşa wê tê hemberî wê û bi wê re diaxifê û ji wê dipirsê ku ew dixwezê çi bikê.

-Ezê herima zindanê û bi wî zembîlfiroşî rû bi rû bibînim.

-Xatûna mina delal tu neça. Min bişêne, ez herim wî bi wî re biaxifim û wê fêr bibim.

Pêşî hinekî xatûn hizirî ku ew wê bikê û ankû nekê bi wê. Piştî ew biryara xwe dide ku ew bi xwe herê. Dema ku ew çû qerwaşa wê jî wê li rex wê were bi wê re. Ya di dilê Gûlê Xatûnê de wê ew bê ku ew kesekê çawa ya wê fahmbikê. Wê hîskiribû ku ew ne kesekê ji rêzê ya. Lê ne dizanî û tê dernedixist ku ew kî ya.

Hinekî din dem têve çû û ew bi hevdû re hatina xwerê bi zembîlfiroş re rû bi hatin. Gûlê xatûnê çî got û ne got zembîlfiroş ji ya xwe û îlada xwe ne hat xwerê. Di wê demê de wê, gûlê xatûnê wê, ew ji ya ne hat xwerê û wê xwest ku ew wî di zindanê de bigirê. Lê di zindan de girtina wî jî wê, weke ku wê ji aliyekê ve wê rast ne di dît. Ber vê yekê wê, hinekî hizir kir ku ew çî bê. Li ser wê yekê wê, dema ku ew hizirî bi wê haznê hat jor li odaya xwe. Lê hinekî jî weke bi hêrs dihat dîtin.

Di wê demê de wê, qerwaşa wê bixwezê ku ew bi wê re biaxifê û wê bi ya di serê wê de wê fahmbikê. Piştî wê re wê, hinekî ew bi hevdû re axiftin.

-Ev kî ya û çî kes a, ez çî dibêjimê û didênima ber red dikê.

-Rast a xatûna min. Wusa tevdigerihê ku ew ji malek asîlzade ya.

-Tu dikarê wî şopa wî bide şopandin ku ew kî ya û ne kîya wê fêr bibê.

-Erê xatûna min ku wê bixwezê ezê wê fêr bibim.

-Divê ku ew heya mîr jê nebê.

-Bila xatûna min.

Qerwaşê kare xwe weke ku xatûna wê ji wê re hanî ser ziman kir. Lê wê ne dizanî ku wê ji kûdê wê destpêbikê. Wekî din hinek hizirna din di serê wê de bûn. Lê wê dilwaswasî dikir ku ew wan ji xatûna xwe re wê bênê ser ziman. Lê di kêliyekê de wê, bédengîya xwe parast û bi nerînek watedar li nava çavên xatûna xwe nerî. Gûlê Xatûn fahmkir ku ew hinekî tişt di serê wê de hena ku ew dixwezê bêjê û nabêjê. Pêşî Gûlê xatûn li bendê ma ku ew ku ew ya di serê xwe de ew ji wê re bêjê. Ber vê yekê ji

wê re neçû û ne xwest ku ew jî ji wê herê. Wê jî bi çavekê weke ku ew li bendê wê û axiftina wê bê li wê nerî. Piştîre Gûlê Xatûnê fahmkir ku wê ew ji wê re wê ew ya di serê xwe de ji wê re newênê ser ziman û wê ew ji wê pirsî.

-Weke ku es fahmdikim tiştêkê di serê de te di haznkirin û hizrandin.

-Erê xatûna min. Ez dihizirim ku ez ji kûderê deestpê bikim.

-Pêşî fêr bibe ku ew ji kû ya û karê wî ku ew zembîlfiroşî bê ew wê demê ew karê safarîyê dikê. Ber ku zembîl ji sifirê çêdibin û safar wê çêdikin.

-Erê xatûna min. Ez dikarim hemû safarên li vir binerim.

-Lê ez ne di wê baweriyê de me ku ew ji nava safarên vê bajarê ya. Ew dibê ku ew ji deverêk din hatibê.

-Axiftina wî bi ser ya nisêbînîyan de diçê. Nêzî ya botiyan a. Li van herêman gelek kesên bi wê karê hena û malên wan herttimî dihên van herêman.

-Tu rast dibêjê. Wê demê ti çû dihizirê? Em çawa dikarin fêrbibin?

-Xatûna min a delal û nazik û nazdar, tiştêkê di serê min de heya lê ez di dilwaswasîyê de me ku ez ji ter bêjim.

-Dêka bêja ya di serê xwe de. Ne dibêjin 'aqil ji aqilan çêtir heya.'

-Ew gotin ne di her demê de bûhûrîner a.

-Dêka tu ya di serê xwe de bêjê emê li gorî wê bêjin ka kîjan aqil li jîyan kîjanê re ya.

-Xatûna min ez dibêjim, tu fermanê bide ku ew ji zindanê were berdan. Bila ew bê şopandin ku ew li kû kar dikê ew wê hingê rastarast wê herê wir û ji wir male wî li kû bê wê ew wê herê wir.

-Tu rast dibêjê. Ya ku te got bi aqilê min ket.

-Spas dikim xatûna min.

Piştîre Gûlê xatûn di wê demê de di cih de biryar da ku ew ku ew ji zindanê were berdan. Piştîre ji qerwaşa xwe re got ku ew bi malê xwe û tiştên xwe re ku ew çawa hatîya wusa bê kêmesî herê. Qerwaşê got 'bila xatûna min' û ew ji cem wê di cih de vaqatîya û bi ber hundirê aliyekê din ê qasrê ve çû. Li wê aliyê ku ew bi wê çû li wir gelek nobadar hebûn. Wê dema ku qerwaşê çû ew li devera ku ew çûyê de ew rastî heman nobadarên ku ew dema ku xatûna wê ferman da ku zembîlfiroş bidina girtin ew li wir bûn. Wê xwe gihand wan û ji wan re fermana xatûna xwe ragihand. Ji wan xwest ku ew di cih de zembîlfiroşî ji zindanê derxin û hemû tiştên wî bê kêmesî radestî wî bikin û ew bê serbest berdan.

Wan jî di cih de hemen tevgerîyan û çûn û zembîlfiroş ji zindanê derxistin û hanîn cem zembîlên wî û ew serbest bardan. Zembîlfiroş ji wan pirsî ku ew kê ew dana berdan. Nobadaran ji wî re got ku xatûna mîr biryara berdana wî daya. Wî jî di wê demê de ti cih de tûrikê xwe avêt milê xwe û zembîlên xwe avêt piştta xwe û ji wir bidest vaqatîne kir. Qerwaşê di wê demê de wê ti kesek bi erk nekir ku ew wî bi şopênin. Wê bi xwe re kar hilda ser xwe û wê, heta devera ku wê, herîyê de wê, ew şopand.

Zembîlfiroş pêşî hat male xwe nava zaroyên xwe. Di wê demê de ew male wan ne li deverek dûr a ji wir bû. Lê ew li deverek weke çolemergekê di xaniyekê piçûk de bi xizanî dijîn. Qerwaşê dema ku ew dît bêî ku ew wî bi şopênê li devera cihê karê wî ew şopandina xwe berda. Piştire ew rastarast bi lingekê zû bideest hatina cem xatûna xat kir. Wê dema ku ew gihişt cem xatûna xwe wê, weke ku ew bi bêhn bi bêhn mabû.

Berî ku Gûlê Xatûnê ji wê bipirsê ku ew çî hal û rewşa ku ew di wê de qerwaşa wê bidest axiftinê kir û wê ji wê re hemû tiştê ku wê dîtî wê ji wê re vegot. Di wê rewşê de wê, êdî dizanî ku ew kesekê çawa ya. Herkesekê ew weke kesekê xizan ku ew debare xwe bi zembîlfiroşîyê dikê dizanî.

Gûlê xatûn di wê demê de hizirî ku ew çî bê û çawa bê. Wê di xwest ku ew di awayekê de xwe bigihênê li wî. Ber ku wê ew ji serê xwe ne diavêt. Bi wê rewşê de wê, xwe hinekî li hazn û hizran berde. Di serê xwe de bidest hizirkirinan kir. Di wê demê de qerwaşa wê li rex wê sekinî bû. Weke ku ew li bendê bê ku ew tiştêkê ji wê re bêjê ku ew bikê di pozisyonekê de wê xwe girtibû. Lê Gûlê xatûn di wê demê de ew di serê xwe de weke ku ew hinekê bi hizir û hazn bû. Ew di nava fikirandinê de bû.

Demek dirêj wê bi wê rengê wê derbas kir. Piştire wê weke ku wê li xwe were lê hat. Bi rûdeneka weke ku ew dizanê ku ew çî bikê û ankû wê di serê xwe bi hizirkirinê wê dît ku ew çî bê wê, serê xwe rakir û li dora meyizend. Pêşî berê rûdêna xwe da qerwaşa xwe. Di wê dema ku wê li qerwaşa xwe nerî, qerwaşê jî wê, weke ku ew amede bû ku ew ji wê re tiştêkê bêjê. Lê tiştêkê ew da sekinandin. Bi carekê deng zêde ji derve weke ku ew hatina hundûr. Gelo çî qawimî? Wê di demê di cih de Gûlê Xatûnê li qerwaşa xwe nerî û ji wê re got ku tu binera ku ew dengên qalabalix ber çî tên.

Qerwaşê di cih de wê, xwe lev da hev û bi ber devê dêrî ve çû. Hê ku ew derneketî dengê mîr hat gûhê wê û di cih de wê, berê xwe da Gûlê xatûnê û gotiyê “xatûna min mîr hatîya.” Dibê ku ji wê qalabalixê û dengan Gûlê xatûnê jî hizirkiribê û tefkirkiribê ku mîr hatibê. Lê wê, weke ku wê xwestibû ku ew êmin bibê ku ew deng ber çî tîn û ji kû dihên.

Piştî wê ne bi gelekî re wê mîr jî wê were hundir û wê, rastarast wê pêşî wê bi mirovên li dora xwe re wê herê odaya rûniştê a weke dîwanekê ku ew hertimî bi kesên li dora xwe li wê dirûnişt û bi mirovên li dora re diaxift û ankû li derdan dihisand.

Gûlê xatûn wê carê hatina mîr ew hinekê bi dilper kiribû. Gelo ber çî bû? Wê hertimî mîr diçi û dihat. Lê wê carê wê weke ku wê tiştê li pişt wî kiribê bi hîsekê ew di xwe de mabû û wê, ew hîsa di wê de wê, gelek bêhûzûr dikir. Wê ne rehet dikir.

Mîr wê demek dirêj wê bi kesên li dora xwe rûnihê û wê bi hevdû re wê bidin û bistênin. Lê di wê demê de wê, piştê ne bi gelekî re wê mirovên li dora wî deestûrê jê bixwezin û wê yek bi yek wê ji wî herin. Piştê ne bi gelekî re ku mîr bi çend kesên ji qasrê bi tenê ma di dîwanê de wî jî êdî destûr ji wan xwest û hat odaya ku ew li wê bi gûlê xatûnê re dihê cem hevdû. Ew jî piştê ne bi gelekî re ew hat wir û li wir wî gûlê xatûnê li cihê xwe rûniştî wê dît.

Mîr hat û pêşî bi gûlê xatûnê û xweşikatiya wê ya ku weke ti xweşikati li ser wê re tûnaya re çav bi çav hat û li wê nerî. Te digot ku qey ew xweşikatiyek bêhempa a ji bihûştê bi teybetî derketîya û di laşê Gûlê xatûnê de bicih bûya.

Piştî ku mîr hat odayê wê qerwaşa wê kesên li dorê wê wan bi tenê bihêlin. Piştê ew bi tenê man û hinekî bi hevdû re bidest axiftinê kirin. Piştî ku ew hinekî bi axiftin û mîr li rewş û halê wê pirsî êdî piştê gûlê xatûnê ku wê got ez başim û sihete min li cih a û pê de ew jî rûnişt li cihê xwe û hinekî bi hazn bû.

Gûlê xatûnê wê dît ku Mîr hinekî bi hizir û hazn a. Hinekî jî weke ku ew mitale dikê dihat dîtin. Gelo ku ew mitale bikê ew mitale çî dikê? Wê hinekî ew di serê xwe de hizirkir. Wê pêşî hizirkir ku ew ji wî bipirsê ku ew çî dihizirê. Lê hinek hêstna ku ew di serê Gûlê xatûnê de bûn wê, dana sekinandin. Ew jî piştê li ber mîr weke ku ew hinekî bi hazn bû. Lê mîr ji hazna xwe wî hazna Gûlê xatûnê wê farq jî nekir.

Weke demekê wê wusa bi hevdû re dem weke bi bêdengî derbaskirin. Piştê ya ku wê ji wê rewşa haznê ku wê pêşî wê were xwe wê Gûlê

Xatûn bê. Gûlê xatûn bi aqil û hişmendîya xwe jî wê pirr zêde wê baş bê. Wê jî perwerdeyek pirr zêde baş ji xaneyên mazin ên civakê wê ji zaroktiya û heta mazinbûna xwe wê girtibû. Ew jî weke kes û jinek bi zane dihat dîtin û zanîn di nava xalkê de. Bi aqilê wê bawerîya herkesekê hebû. Ya mîr jî hebû. Ber vê yekê wê çî gotiba mîr ne di got na. Wê weke wê kiriba.

Piştî Gûlê xatûnê xw eli hev dabû û cegerê xwe berhev kir û wê gotina pêşî li mîr kir û jê pirsî ku ew ber çî ji dema ku ew hatîya ve ew bi hazn û hizir a.

-Mîrê min, ji dema ku tu hatî ve weke ku tu ne li vir î. Hişê de li der û deverêk dîn a. Dêka i min re bêja ku hişê de li kû ya. Çî di serê te de te wilqasî dide hizirkirin.

-Xatûna mina delal û xweşik, çî ji û avdan vêşerên lê nikarim ji xwûde veşêrêm. Ez dema ku ez digirim. Min malek pirr zêde xizan dît. Lê mirovên di wê de pirr zêde bale min kişand û ez hêstîyar kirim. Min pirsî ku ew kî na. Ji min re agahi hat ku ew male zembîlfiroşekî bû. Lê min ew ne dît. Ew mal ma di dilê min de.

-Mîrê min ya ku te wilqasî bi bandûr kiriya dibê ku ew tiştêkê giring bê. Ew qûdretêk bê. Tu dikarê mirovan li pey wan bişênê ku ew bibînin.

-Tu rast dibêjê, weke her demê dîsa tu bi aqilê xwe axiftî.

Piştî mîr ew gotina gûlê xatûn bihîst wî di cih de ferman da ku ew herin wê male xizan û xwedîyê malê zembîlfiroş bibînin û bênin qasrê cem wî. Gûlê xatûn di wê demê de di serê xwe de ket mitale de. Gelo ew kes kî bû û çawa bû. Dema ku mîr gotibû 'ew male zembîlfiroşekê bû' wê demê di serê Gûlê xatûnê de ew hizir rûda ku ew zembîlfiroş dibê ku ew zembîlfiroşê ku wê xwestibû li qasrê bê. Ji aliyekê ve wê, ev levkirina weke rasthatinekê hem wê weke ji aliyekê ve weke kêfxweş kiribû û hem ji ji aliyekê ve wê kiribû mitale de. Dibê ku ew ne ew kesê ku wî dizanî bû. Lê dibê ku ew jî bê. Di wê temenê de wê, ev rasthatin di hazarî carekê de pêktê û gelo ew nîşanaka çî qewîmînê ku ew li pêşîya wan xwûde wê derxê bê? Ew hinekî weke ku ew li wê hizirî. Di wê temenê de wê, gûlê xatûnê wê dema ku ew bi wê ket hizran de wê, demê ew weke ku ew ji axiftina bi mîr re jî qût bibê lê hat. Mîr di wê demê de ew jî weke ku ew bi tene serê xwe mabû. Gûlê xatûnê ji hizrên di serê xwe de ku ew bi wan ve meşkul dibê wê alaqa jî weke ku wê, êdî ne dida mîr. Mîr ew fahmkiribû. Lê mîr tiştêk ne digot. Wî gotin bi lêvkin û hanîna ser ziman a di wê rewşê de jî weke ji mazinatiya xwe di dît. Ber vê yekê wî ew ne kir. Lê bendê me ku Gûlê xatûn berê alaqa xwe bide bi wî ve

û ew li wî bide nîşandin. Lê ew jî wê, kengî bûba û ankû wê bûba ba ew ne dîyar bû di wê heyemê de.

Mîr û Gûlê Xatûn demek dirêj di wê demê de bi hevdû re derbaskirin. Mîr di wê rêwîtiya xwe de çî dît û jînkir weke ta bi derzîyê ve bikê ji Gûlê Xatûnê bilêvkir û hanî ser ziman. Wan bi wê demek dirêj bi hevdû re bihûrand. Heta demek dereng ku wê weke dema xwarinê bê.

Mîr û Gûlê xatûnê wê, piştî ku wê, dema şîvê were wê êdî wê weke ku wê, ji hevdû biçîn Ber ku gelek mêhvanên mîr hevdû û mîr divîyabû ku wî bi wan re dema xwe bûhûrandiba û xwarina xwe bi wan re bixwara. Ev wê weke ji adetek civake mîr dihate zanîn.

Wê demê Dema ku Gûlê xatûn bi tenê ma li dora wê hinek xatûnên din jî hebûn. Qerwaşa wê ku weke hevalbendê derdên wê jî bê bi wê re wê li rex wê sekinî bê. Ew hertimî weke bi wê ve zeliqî bê wê li rex wê bê. Li rex wê dihat dîtin.

Dem ku wê hinekî din bi ser ve herê û wê dem bê dereng ku wê, yên ku ew herina malê wê herin û yên ku wê li wir wê xwe bikişênina li odayên xwe yên razanê jî wê bikişênin wê dema wê were. Di wê demê de ku ew bû wê, êdî wê Gûlê xatûnê wê hinekî wê bi qerwaşe xwe re wê bi tenê wê bimênê. Gelek pirsên bêbersiv di serê wê de hebûn û wê, wêre ne dikir ku ew wan di wê kêlîkê de werênê ser ziman ku ew kesek din zanibê.

Di wê demê de wê, qerwaşa wê li rex wê li wê binerê û wê dema ku wê li wê dinerî wê weke ku wê, hinekî fahmdikir ku ew çî di serê xwe de dihizirê. Lê wê weke ku ew nizanibê û alaqa wê ji wê nebê ew tevdiogerîya û rewşa xwe dide nîşandin.

Wê rojê wê bi wê rengê wê roja wan wê derbas bibê. Roja din ku ew hat wê, di wê demê de wê çî ji wan re bi xwe re wê werênê ew jî wê di serê gûlê Xatûnê de weke ku ew li bendê bê. Di wê demê de wê Gûlê xatûnê wê, dema ku wê herkesekê wê xwe vekişênê li odayên xwe û wê razihin jî wê di wê demê de wê xewê çavên wê ne digirt. Ew di mejiyê xwe de şîyar bû. Weke ku wê mejiyê wê, ne di xwest ku ew razihê. Di wê rengê û rewşê de wê, xwe di awayekê de digirt.

Piştî ku mîr hatibş nava nivînên xwe û ew bi hevdû re ketibûbûna nava nivînên jî wê weke ku wê hişê wê ne li wir bê. Wê weke ku ew hişê wê li deverek din bê. Di wê demê de mîr jî di aslê xwe de fahmkiribû ku Gûlê xatûnê çî dihizirê. Heta ku wê dema ku wan kara razanê kir û xwe amede dikirin wê, gotina ku wê ji devê mîr li wê rewşa gûlê xatûnê wê were ser ziman wê ew bê ku 'tû weke ne rehet xwe dide dîyarkirin. Tu çî dihizirî wilqasî di serê xwe de.' Lê Gûlê xatûnê weke ku ew ji xwe ew ne li wir

bê wê di destpêkê de wê weke bersiva perisa mîr wê bi derengiyekê bide. Wê derengiyê jî male mîr kişandibû. Lê piştire weke ku ew were xwe û ew bihizirê ku pêwîst bû ku ew di cih de bersivê bide mîr wê, xwe hîskiribû. Weke xewnekê û ku ew weke hinekî di serê xwe ne bi dîyar jî bê wê, pirsra mîr wê, were hişê wê. Lê wê di wê temenê de wê, bîryara wê weke ew ku di serê xwe dîyar wê dabû û wê, di wê demê de wê, ew bersivandibû. Wê, hêncetekê din di serê xwe de çêkiribû û dabû mîr. Weke ku ew li ser hinek tiştên ku wê dema ku ew bi gelek xatûnan re rûniştî ku ew bide wê, bersivek dabû. Lê piştî ku ew ketina nava nivînê û hê ku wan serê xwe ne danîbû ser balgih gûlê xatûnê berê xwe dabûbû mîr û jê pirsî bû ku ma agahi hatîya ji kesên ku te nobadar li pey wan şadibûn. Mîr bersiva wê di cih de dabû û gotibû, “na hê ne hatina lê ew dîyar bû wê bihetan. Di wê demê de wê, di cih de wê werin. Ber ku kesên ku ew cihê û wan kesan nasdikir serbazê wî yê ku ew hertimî li kêleka wî bû û ew bi çend kesên li dora xwe re çûbû ku ew wan bènê li ser gotina mîr.

Zembîlfiroş, jina wî û zaroyên wî tên birin li qasrê

Piştî ku mîr ferman dabûbû ku ew çend mirov herina pey wê malbate ku wê bale wan kişandî wê, êdî wê serbazê wî û bi çend kesan re wê herin. Ew jî li ser piştira haspên bi hûner û rehwal demek dirêj bi lez û baz çûbûn. Lê di dawîya dawî de ew gihiştibûbûna nêzî cihê ku wê çûbanê de.

Di wê demê de wê, dema ku ew digihijina wir wê, hinekî dem wê dereng bê. Serbaz wê weke mirovekê bi fikir û aqil bê. Wê dema ku ew gihiştina ber nêzî male zembîlfiroş û malbate wî ew li deverekê li haspên xwe paya bûn. Yekî ji sêwarê wî berê xwe da wî û li wî axift.

-Ez benî tu çûma sekinî, va em gihiştin nêzî malê. Em herin wan hildin û wan bibin û rêya xwe bidomênin.

-Rast a em dikarin wê bikin. Lê haspên me hinekî wastîyayî na. Û birçî bûna. Wekî din dem hinekî bi derengî ketîya. Mîr ew ne weke kesna ku em hema bi çembilê wan bigrin û wan bibin xwest ku em wan bibiin. Mîr bahsa nêzîkatîyek baş kir ku em li wan bidina nişandin.

-Wê demê tû ezbenî çî dihizirê?

-Ez hinekî bê biryar mam di wê rewşê de. Ya dilê min ji min re dibêjê ku em hinekî bisekin in. Bila tarîya şevê derbas bibê. Hinekî rohnî bikeve ardê. Piştire em herin û bi zimanekê xweş bi wan re biaxifin û ji wan re bêjin ku mîr ew xwestina û em hatina wan bibin.

Wê dema ku wî wusa got yê sûwar ma sekinî. Weke ku ew êdî ti gotina wî ne mabû ku ew bibêjê. Tenê gotina ku ew di teliyê de ji nava lêvên wî derket wê ew bê û wê got ku 'baş a ezbenî emê weke ku te gotî bikin' û ma sekinî. Piştî wan li deverê ku ew karibin xwe di wê bisitirênin û haspên xwe bigirin û hinekî haspên xwe li wir biçêrênin jî dîtî û li wir man. Devera ku ew li wê man weke kozekê li çolemergeyê bû. Di wê demê de ew wê li wir wê bi hevdû re wê şiyar bimênin heta dema ku wan hizirkiribû ku ew herina male wan. Wê demê ew divîyabû ku ew heta ku ahlê malê ji xewê rabê, taştêya xwe bikê û pê de ew herina û li devê derîya wan bixin. Wê di wê demê wê ew jî wê bi wê re êdî wê bikin.

Piştî ku wê di wê demê de wê dema wan nêz bibê ew jî wê êdî wê kare xwe bikin û wê bi ber malê ve wê herin. Di wê demê ji wan re ne zor bû ku ew haspna din ku ew wan li wan sûwar bikin û ankû arabokna ku ew wan bikina wan û heta qasrê bibîn bibînin.

Piştî ku ew dihên êdî ew dihêna devê derîyê male zembîlfiroş ku ew hê li male. Ew weke mirovekê ku ew zû ji mal derdiket û diçû ser karê xwe. Lê dema ku ew hatina wir êdî wan bi awayekê nazik gotin taq taq û li devê dêrî xistin. Yê ku piştî ku wan li devê dêrî xist û derî ji wan re vekir wê Zembîlfiroş bi xwe bê. Wê dema ku wî mirovna sûwar û bi heybet ku li piştî wan tîrûkavan heyî, şûrên wan li piştî wan û xançerên wan di ber wan de dihatina dîtî wê, hinekî wê weke rewşek awarta wê di wê demê de wê di mejiyê zembîlfiroş de wê biafirê.

Ku Zembîlfiroş ew wusa dîtî û bi heybet li wan nerî, pêşî wî nizanî ku wê çî bikira. Lê piştî bi qadarekê wî ew bûhûrî hundir kirin.

De ne, zembîlfiroş ji xanima xwe re bahsa zindankirina xwe kiribû. Wê dema ku wê jina wî ew dîtî bi wê rengê dilê wê zûtirin bi deest avêtinê kir. Wê zankir ku ew hatina cardin Zembîlfiroş bibin zindan bikin. Di wê demê de wê, serbaz wê derkeve li pêş û wê zimanekê nazik, xweş û hêdîka û dengê nimz wê bi zembîlfiroş re wê biaxifê û wê ji wî re wê, bi gotinên ku ew dikarê bi rehetî fahmbikê wê bêjê ku "mîrên tu û malbate xwestin ku ew li qasrê wan biikê mêhwan." Vê gotina gotina ku wê, di wê demê de wê, di wê de wê, dilwaswasîyê wê di serê zembîlfiroş de wê çêbikê wê, ji wî re wê zor bê ku ew bersivê bide wan. Lê Zembîlfiroş ku wî hinekî xw eli hev da hevdû wî jî bi wan re bidest axiftinê kir.

-Hun li ser gotina mîr hatina hun min û malbate min bibina qasrê

-(Serbaz), ezê lê em ne bi nîyet û armancek din hatina. Ew dema ku ew di gerînê de bû hatîya ber devê derîyê û tasak av ji male vexwartiya û ew

pirr zêde dilê wî girtîya. Wî jî li ser wê xwestîya ku ew qanciyeke bi we bikê. Weki din bila ti tişt neçê ber dilê we.

Zembîlfiroş di wê demê de ew tişta ku ew tenê hat bîr û hişê wî ew bê ku ew dema ku ew li sûka mayafarqênê ku ew ji aliyê qerwaşa gûlê xatûnê ve hat birin li qasrê û hat zindankirin hat bîra wî. Ber vê yekê ew ne bidil bû ku ew di wê demê bi malbate xwe re ew bi wan re herê. Di wê demê de wê, Zembîlfiroş wê mêyla ku ew xwe li inade dênê wê bide nîşandin. Serbaz ew ji wî fahmkir û ew bo ku ew pêşîya wê bigirê wî cardin ji wî re axift û soz û peymana xwe hanî ser ziman ku ew tenê bo mêhvankirina wan hatîya. Wekî din ti tiştêkê nîn a. Lê Zembîlfiroş li ser gotinê serbaz fahmkir ku ew heta ku wan nebin wê ne sekin in. Wê demê bela xwe ji wan ne vekin. Piştî wê Zembîlfiroş ji wan re got ku 'ezê bi we re bi tenê werim. Malbate min jina min û zaroyên min bila li malê li bendî min bin.' Wê dema ku wî wusa got 'serbaz ji wî re bidest axitinê kir. Lê dema ku wî bidest axiftinê kir berê xwe da jina zembîlfiroş Rênazê û axift û got ku "bila xwûşka me jî were. Mîre me ew jî dîtîya û weke xwûşka xwe biazimênê xwestîya wek bi hevdû re bibînê. Bi hevdû re werin.'

Li ser wê gotinê wê hinekî wê bii hevdû re wê bi axifin û zembîlfiroş serbaz wê bidina ber hevdû. Înade Zembîlfiroş jî înadek tam bû. Wî ber vê yekê demek dirêj wê li ber hevdû bixin.

Di encama demek pirr zêde dirêj a axiftinê de ku zembîlfiroş fahmkir ku ew bela xwe ji wan venekin ku ew heta ku wan bi xwe re nebin wî herê kir ku ew bi hevdû re herin. Wî tirs a wî ji malbate wî bû ku ew tiştêkê bi wan bikin. Ber ku ew berî hingî tiştêkê jîyankiribû.

Piştê zembîlfiroş qayîlbû ku ew bi jina xwe û zaroyên xwe re herin. Di wê demê de wê serbaz wê arabeyek rêwîtiyê wê bo hemû malbatê wê pirr baş wê bide amedekirin û wê wan di wê de wê bi xwe re wê bibin heta qasrê.

Zembîlfiroş ew dema ku ew di arabokê de diçû bi malbate xwe wî çavên xwe ji jina xwe xwe ne dibirî. Wî hertimî li wan dinerî heta ku ew hatina qasrê wê bi wê re wê, ew wê bikê. Wan nizanibû ku wê çi wê were serê wan. Ku rast weke serbaz gotî ku ew wan bikê mêhvan wê piştê wê mêhvandariya xwe wê bikin û wê piştê wê dîsa wê bi rêya xwe kevin û wê werina male xwe. Lê ew ji wan ne kifşbû.

Piştî rêwîtiyek di demek dirêj de wê, bigihijina li qasrê. Heta ku ew hatina qasrê jî wê, serbaz ber ku wî fahmkiribû ku ew ne dil rehet bûn wê hertimî wê bi zembîlfiroş re wê bikê ku ew bi axifinê û dilê wî rehet bikê ji

aliyî wê û malbate wî ve. Lê çî gotinên ku wî gotin ne dikarin dilê zembîlfiroş rehet bikin.

Piştî ku ew ghiştin li qasrê wê, dema ku wê araboka wan wê werê wê agahi ji mîr re wê herê ku ew dihên. Mîr ji yê ku agahi da wî re got ku 'ew dema ku ew ghiştin agahiyê bid min ez bixwe wan pêşwazî bikim. Gelek kesên ku ew li dorê mereqe dikirin ku ew kî ya wilqasî mîr bi alaqaqekê nêz dibê. Weke ku ew hatîya gotin ew zembîlfiroşeka. Ma ber çî mîr wilqasî alaqaqê ji wî zembîlfiroşî re dide nîşandin wan jî ew di serê xwe de mereq dikir. Ber vê yekê di gotin ku ew mirovekê çawa ya û ji kû ya û ber çî mîr ew dewetî qasrê kir wan di serê xwe lê dipirsî.

Piştê ku wê hinek dem din têve herê wê piştê wê agahi ji mîr re were ku ew hatin. Mîr wê dema ku ew ji cihê xwe rabû wê, di cih de wê civate wî jî wê bi wî re rabê serpîyan. Lê wî hemû civate xwe da rûnandin û wî got ku 'ez bi xwe divê ku mêhvanê xwe weke xwediyê malê pêşwazî bikim. Ev bo min rêz û rûmet a. Bo min şeref a. Win jî weke mêhvanên bi qadr ên male min hewce nakê win rabin û win rehet xwe xira bikin. Wî nehişt ku ew rabin. Piştî ku ew hatin wê mîr bi xwe wê herê hemberî wan wê wan pêşwazî bikê û wê wan bûhûrî hûndir bikê. Hê jî zembîlfiroş wateya wê fahm nedikir û dixwest ku ew wê sedema wê alaqaqê wê fahmbikê. Ber vê yekê wî heya xwe pirr baş dida li dora xwe. Di xwest ku ew di serî de ew rewşê fahmbikê.

De ne, ber ku wê, ew bi malbatî wê werin wê di demê de wê Gûlê Xatûnê jî wê agahi ji wê re wê herê ku wê mîr mêhvanên wî yên bi malbat wê werin û di nava mêhvanên wî de jin hena û ew jî pêwîst bê ku ew li rex mîr bê û wan pêşwazî bikê. Ev wê weke adet û kevneşopîyekê bê. Gûlê xatûnê wê dema ku ew agahi ji wê re diçê wê, di cih de wê, bakê qerwaşa xwe û wê bi wê bi şewirê û ji wê bi pirsê ku ew kî na wê werin.

-Qerweşa min, qerwaşa min, ew kîna weke mêhvanê mîr wê werin bi malbatî bi jin û mêran ve.

-Xatûna min a delal, yên ku ew dihên wê, ew malbate xizan û faqir a wî zembîlfiroşî ku mîr bahsa wî ji ter kiribû. Mîr bi serbaz re çend şandibûn ku ew wan bînina qasrê. Nûha jî ew hatin.

-hiii, demek ew in. ..

Gûlê xatûnê ev gotin ji dewê derket û ma sekinî. Weke ku ew hinek gotinên din jî di serê wê de hebûn ku wê bihanîya ser ziman lê wê gotinên xwe weke qûrtandin. Wê di qiriqa xwe de hiştin û ne derxistin.

Lê dilê Gûlê Xatûnê pîrr zêde bi lez bidest lê danê kir. Wê jî di wê demê de wê, di cih de kar û amedeyîya xwe kir û di cih de bidest derketinê kir. Qerwaşa wê jî li rex û hinekî li şûn wê bi wê re bidest meşînê kir. Dema ku ew derket wê, li hinekî herê û wê dema ku ew gihişt nêzî devê deriyê qasrê ku ew ji hundir derkevin wê, rastî mîr were. Di wê demê de wê, mîr wê bibînê. Gûlê Xatûnê bi awirekê lêpîrsîner li nava çavên mîr nerî û wê weke ku wê xwe amede kir ew li wî bi axifê tişteke bibêjê û ankû bipîrsê. Lê mîr hinekî ji wê dûr ku ew hê ne gihiştî cem wê, bi dengekê hinekî ne zêde bilind û ne zêde nimz jî berê xwe da wê li wê axift û got “xatûna mîn, gûlê desta min tû hatî.” Gûlê xatûnê got ‘erê mîrê min ez hatin’ û ma sekinî. Çû û li rex wî sekinî û bi wî re bidest meşînê kir. Mîr derket li pêş û ew li pêşiyê derket û çû pêşwazî kirin. ..

Dema ku ew derketin wê li ber devê deriyê qasrê û hinekî ji devê deriyê hundir dûr wê rastî hevdû wê werin û mîr bi rêz û hûrmetekê ew çû û xweşhatina kir. Piştê jî ew çû û bi ber zembîlfiroş ve û ku ew destê wî bigirê. De ne ew weke adetekê bû. Mîr çûyina bi aliyê jina zembîlfiroş ve ji Gûlê xatûnê re hişt. Gûlê xatûnê jî wê weke ku wê zanibê wê çî bikê wê, berê xwe da bi ber jina Zembîlfiroş ve çû bi ber wê ve û xweşhatina wê kir. Piştê wê dewetî hundûr kir. Lê pîrr zêde wê li nava çavên wê dinerin. Gûlê xatûnê dîtî ku ew zembîlfiroşê ku mîr bahsê kiribû ew zembîlfiroşê ku wê xwestibû li qasrê û wî zindan jî kiribû. Wê dema ku wê zembîlfiroş çavên wê bi gûlê xatûnê wê bikeve wê weke ku wê hinekî bikeve rewşek awarta de. Wî wusa di xwe de hîskir. Lê wî di xwest ku ew ti kêmesîyê nedê nîşandin û piştê ew bi xwezayî tevgerîya. Di wê demê de wê, bixwezê ku ew xwe di rewşek baş de bigirê.

Di wê demê de wê, piştî ku wê bûhûrîna hundir wê pêşî wê, bi hevdû re wê herina diwane rûniştinê. Her çendî ku wê di qasrê de wê cihê jin û mêran ji hevdû ê rûniştê wê cûda jî hebê lê pêşî ew bi hevdû re çûbûna diwana mazin û li wê rûniştibûn hinekî û hemû mêhvanan ew dîtibûn û wan jî mêhvanên mîr dîtibûn.

Di wê demê de wê gelek bal, hey û çav wê li ser zembîlfiroş bin. Di wê demê de wê mîr jî wê çî û çawa wê li zembîlfiroş wê bi axifê ew jî dihat mereq kirin. Wê bi çî gotinê wê bi axifta û wê çî bihanîya ser ziman wê armanca mîr a bi dana hanîna zembîlfiroş re wê bide dîyarkirin. Wekî din wê ew jî wê bi wan bide nasîn. Gelek kesan di xwe de digotin ku ew dibê ku ew ne zembîlfiroşek bê. Ew kesekê din ê giring bê ku ew di rengê zembîlfiroşekê di nava xalkê de digerihe bê. Lê mîr ew naskirîya û ber vê yekê ew hanîya qasrê. Lê nizanibûn ku ew rast a û ankû ne rast a. Wan di

xwest ku ew beremberê alaqaya mîr a li zembîlfiroş xwe bigihênina li zanînekê. Ew fahmbikin ku mîr ew ber çî hanîya wir. Mîr di wê demê de wan dide rûnandin û pêşî xweşhatina wan dikê. Piştî jî ew jî sipasiya xwe dikin û silevê ji kesên li dorê re jî didina didin. Wê demê wê, piştî ku wê ew hinekî li hevdû rûnihin wê, piştî wê ne bi gelekî re wê jin wê li ser pêşegîya gûlê Xatûnê wê herina aliyên din ê qasrê ku ew li wê bi rehetî bimênin. Gûlê Xatûn gelek caran ew bi mîrê xwe re di nava civate wî de maya û axiftiya jî. Ew jinek wusa bi ceger, wêre, ji xwe bi bawer û xwedî gotina xwe ya bi zane bû.

Piştî ku wê hinekê dem wê têve wê herê wê, xwarin û tiştên xwarinê wê, werina ser ziman. Lê di nava civate mîr de wê gelek kesên ku ew di xwestin mereme wî bi zembîlfiroşî re wê fahmbikin û fahm nekiribûn û hebûn. Piştî jî wê, yekî kesa ku wê navê wî **‘Bawer’** bê û pir jî navserî xwe bû û kal bû wê, di wê dema axiftinê de wê, ku wî bidest axiftinê li mîr kir wî pîrsa xwe li mîr kir û bahsa mîhvanîya zembîlfiroş kir. Mîr di wê demê de wê rastarast wê bikeve gotinê û wê bahsa rêwîtiya xwe bikê û wê bahsa li wir sekinînê û vexwartina ava wan û xwarina navê wan wê bikê. Wê demê wî jî li ser wê çawa xwestiya ku ew beremberê wê mêhvandarîya xwe ji wan re bide nîşandin wê, bêtê ser ziman.

De ne di nava civate mîr de divîyabû ku ew cûdahî bo mirovan nebûba ku ew faqîr ban û ankû kesna dewlemend ban. Kesna mîrzade ban û ankû kesna ji rêzê ên ji nava xalkê ban. Ew cûdahî weke kêmesîyek ji mirovtiya mirov û male mirov dihat dîtin.

Piştî mîr hanî ser ziman ku ew dixwezê cihekê li dora qasrê bide wan û wan li cem xwe ragirê. Û Zembîlfiroş jî weke kesekî li cem xwe wî bicih bikê. Di wê demê de wê, dema ku wê zembîlfiroş wê bibîhîzê wê, nizanîbû ku ew wê çî bêjê. Wî di wê demê de wê rewşa xwe di wê rewşê de xira nekir. Wî di wê rewşê de weke zembîlfiroş tevgerîya û piştî tiştî mîr got wî weke wî kir.

Lê li aliyê din wê, rewşa Gûlê xatûnê û jina Zembîlfiroş wê balkêş bê. Wê Gûlê Xatûnê hertimî awirên xwe weke ku ew li hewiyekê binerê wê li wê dinerî û wê awirên xwe ji ser wê ne di birin û ne di vaqatandin. Demek dirêj wan wusa derbas kir û bi hevdû re derbas kir.

Jina Zembîlfiroş jinek bi zane bû. Wê jî di male bavê xwe wê, xwandina xwe tawa kiribû û kesek bi zane bê. Di wê demê de wê çî wê were axiftin û ji çî rewşê û herêmê bê wê dizanî. Wê di wê demê de wê weke kesek bi zane ku ew pêşî li hevdû rûştibûn weke ku wan xwestibû ew qama hevdû bi zanîna hevdû bi pîvîn. Ber vê yekê wê pêşî wê hinek pîrsên li

ser zanîn û mantiqê û hwd wê ji hevdû bikin. Wê ji zaneyên civakê ên demên berê û wê demê wê hinek gotin wê bilêvbikin. Gûlê Xatûnê di wê demê de ew kesek pîrr zêde şahraza bû. Wê, di wê rewşê de wê gelek mijar bi carekê wê hanîbûbûna ser ziman ku ew li ser wan biaxifin di nava hevdû de. Wê nerîn û awira xwe biribû ser jina zembîlfiroş ku ew çiqasî wê karibê wan zanînen ku wê di nava hevdû de hanîna ser ziman wê ji hevdû derxê. Wê hinekê di wê rengê de wê weke ku wê xwestibû ku ew zanîna wê bizanibê.

Di wê rengê de wê, dema ku wê, mafê gotinê wê were jina zembîlfiroş wê di wê demê de wê ew jî wê bi dengekê rehet û bi xwe bawer wê gotinên xwe binaqênê û wê bi wan wê biaxifê li kesên li dora xwe. Di wê demê de wê, ew wê, weke aliyekê wê yê giring wê xwe bi wê re wê, bi baldarî wê bide nîşandin. Jina zembîlfiroş ew întîba bi xwe re di demek pîrr zêde kort de kiribû serê mirovên li dora xwe ku ew çendî jinek bi zane û şahraza ya. Wê, di wê demê de wê, ew dabûbû nîşandin.

Qerwaşa Gûlê Xatûnê weke her demê ew li rex wê sekinî bû û wê li wan dihisand. Ew jî yeka ji xwe razî bû û dema ku mafê gotinê hatiba li wê, ew wê kariba weke kesek ji wan bi zane biaxiftiba. Ew jî ne yeka hesan bû. Di wê demê de wê, dema ku wê li jina Zembîlfiroş dihisand ku ew diaxift wê, bi wê re wê awirên xwe bibê ser Gûlê xatûnê ku ew çî dikê û çawa lê dihisênê. De ne, carna wê awirên mirov wê gelek tiştan wê ji mirov wê bidian gotin. Wê qerwaşa Gûlê xatûnê jî wê bi awirên xwe xwestibû ku ew di wê rengê de ew fahmbikê ku Gûlê Xatûnê xwediye çî rewşê, nerîn, awir û xûynîşandinê bê. Di wê demê de wê derfeta gûlê xatûnê nebê ku ew bêhvila xwe xahr bikê û ankû rûyê xwe bi qirmîçênê. Ber ku ew weke xatûna qasrê bû û kesên li wir weke li male wê bin û ew wê mêhvandariyê divîyabû ku ew wê bide nîşandin. Ku kemesîyek jî ji wê aliyê ve biheta nîşandin wê ew weke kemesîyek mazin wê ji wê re wê bûba nav.

Gûlê xatûnê ber vê yekê ew heta ku ew ji wê dihat ew ku wê ne xwestiba jî ba ew bi dilekê bi xwestek û başîyê li mêhvanên xwe tevgerîya ba. Wê, di wê demê de wê, ew wê weke aliyekê ji keseyetîya wê biheta pirsîn. Gûlê xatûnê di wê demê de wê hişê wê herê ser zembîlfiroş. Wê dw dîtîbû û bi wî re çav bi çav hatibû. Lê zembîlfiroş wî çavên xwe ravandibûn ji yên wê. Ber vê yekê ew zêde çav bi çav nemabûn.

Zembîlfiroşdi civate mîr de rûniştî û bi hazn bû. Di serê wî de gelek pîrs û tiştên ku ew li wê bihizirîya hebûn. Mîr weke ku ew dabûbû dîyarkirin

ku ew li wir li rex wî bimênin. Wê demê wê çawa wê, ew redbikira. Di wê demê de wî ew redbikira wê bigotan ku ew ji ber tiştina ravîya. Wê ew jî wê kariba bûba sedema gelek kelmamanan. Ber vê yekê weke mirovekê hesan û ji rêzê çî ji wî re hat gotin wî kir. Wê red nekir. Weke ku mîr ew got ku ew li rex wî bimênî wî ew jî herêkir. Li wir ma.

Li nig qasrê mayîna Zembîlfiroş

Wê demê wê demek têve wê herê bi ser hatina Zembîlfiroş, jina wî û zaroyên li wî li nig mîr û qasrê. Wê, di wê demê de wê piştire wê, ew jî wê, li vir wê mîr wê cihekê ji wan re wê bide amedekirin û ew jî wê, di wê de wê bimênin.

Di wê demê de wê, weke kesna ahlê qasrê jî wê rûmetê bibînin û wê, bèn pêşwazî kirin. Dem bi dem wê, gelek caran ku wê civate mîr li darkeve wê agahi ji wî re jî wê herê ku ew herê di civate de amede bibê. Zembîlfiroş weke kesekî bi mêranî û hûnerîya xwe jî wê piştire wê were kifşkirin û nasîn. Di wê demê de wê, çend caran wê mîr wê herê seyranê û wê ew jî wê bi wî re wê biçê. Wê heta ku wê nêçîrkirinê jî wê di wê demê de wê, carekê du caran wê li ser xwesteka mîr wê bikê. Lê Zembîlfiroş wî dema ku ew çû nêçîrê jî wî heta ku ew ji wî hat wî ne ti tişt girt û ne jî xaft li pêşîya tişteke danî ku ew wê bikê xafkê de. Tîrûkavan jî bikarnehanî

Wusa di rewşekê de ew mabû. Ev rewşa Zembîlfiroş ji bal û heya mîr na ravê. Rojekê mîr wî bi wî rengê di dema seyranê de wî kifşdikê ku ew li ber çemê diclê seyranê dikin de wê, ji wî bipirsê ku ew çima nêçîrê nakê û sedema bi wê rengê xwe ji wê durgirtinê çî bê. Piştire wê, Zembîlfiroş wê bahsa wê bikê ku ew wî ji xwe re qadaxakirîya. Lê wê bahsa malbata xwe nekê.

Di wê demê de wê bahsa wê nekê ku ew ji kûderê hatiya. Çendî ku wê çend caran wê mîr wê gotinê wê bènê ser wê jî ew wê, bersivê nedê û wê mîr jî wê hûrmetê ji wê xwesteka wî re wê bide nîşandin. Wê ji wî re bide hiştin ku ew heta ku ew kengî xwe amede hîsbikê ku ew bixwe êdî ji wî re bilêvbikê.

Di wê rewşê de wê, rewşa zembîlfiroş wê ji gelek aliayn ve wê piştî ku wê mîr û ew li nêzî hevdû wê bijîn de wê, hinekî wê xarîb wî ji wî re wê were. Mîr dizanî ku di wî kûrî de tişteke heya. Lê ne dizanî ku ew çî ya. Wî zan dikir ku ew kûlekê wî yê bi êş hebê. Ber vê yekê kûlên bi êş zor in ku mirov wan werênê ser ziman. Ber vê yekê kengî ku mirov xwe amede hîshikir hingî dikarê wan werênê ser ziman. Mîr jî hinekî li wê

dihizirê û ew zorê nadê Zembîlfiroş ew ji wî re bênê ser ziman. Lê tenê weke kesekê bi fikar û li wî dihizirê û li wî bi hazna wê tevbigerihê.

Lê rojekê wê tiştêk wê bibê. Wê dema ku wê weke her demê wê mêhvanên mîr wê werin mirovekê di nava wan de wê, Zembîlfiroş wê nasbikê. Di wê demê ew wê nayênê ser ziman. Lê pêşî ew li rewşê dinerê ku rewşa zembîlfiroş li wir çî ya û ew ber çî li wir a. Ku ew rewşê bi tememî li wê waqif dibê ew êdî piştê wê, di serê xwe de wê rewşê fahmbikê. Lê rojekê ew mirovê ku ew li mîr bûya mêhvan jî wê, rojekê wê bi mîr re wê herê gerîyanê û wê di wê demê de wê, ew wê gotinê li ser gelek tiştan û rewşan wê vekê û bi gerênê. Piştê wê, gotinê bigerênê û bigerênê û wê werênê ser zembîlfiroş. Di wê demê de wê, mîr ya ku ew di derbarê zembîlfiroş de dizanê wê ew wê werênê ser ziman. Di wê temenê de wê, ew wê, di serî de wê, bahsa wê, wê bikê ku ew çawa wî ew dîtîya, çawa naskirîya û çawa wî ew hanîya cem xwe wê bahsa wî ji wî re bikê. Mirovê mêhvan wê weke mirovekê navxwerî û bi fahm wê heta dawîyê wê li gotinên mîr bi awayekê bêdeng wê li wan bihisênê. Wê, di wê rewşê de wê, ji gotinê mîr wê fahmbikê ku wê rewşa zembîlfiroş li wir çî ya û çawa ya.

Mirovê mêhvan wê demek dirêj bi mîr re wê bide û bistênê. Weke kesekê bi zane wî dizanî ku ew kesan li xwe bide hisandin. Wê dema ku ew diaxift jî wê mîr wê pir zêde bi heya wê bale xwe bide wî û gotinên wî ku ka ew çî dibêjê.

Wê demê mîr hinekî di serê xwe de mereq wî çêbû ji gotinên mêhvanê wî. Ber vê yekê wî xwe ne girt û ji mêhvanê xwe û pirsî ku ew çima wî zembîlfiroş pirsî ji wî.

-(mêhvan), mîrê minê a delal ez ji qanciya te û dilpakîya te ti carî gûmanê nakim. Tu mazinî û mazîn û mîrê paytaxta welatê kurdan î. Ji vê yekê her kesek ji ter bi rêz û hûrmet a. Bavê te jî nas dikin û çendî mirovekê bi zane û bi hûrmet bû. Ez di dema bavê te jî hatima mêhvandariya qasre û di ya te de jî. Te kevneşopîya bavê xwe li ardê ne hiştîya. Dibêjin ku kesên mazin xwe li mazinan digirin. Lê kesê weke zembîlfiroş ku ew li nig te dijî û di bin parastina te de ya ew kesekê bi mîrzade ya.

Dema ku wî got ew kesekê mîrzade ya. Mîr şaş bi heybet li nava çavên mêhvan nerî û tenê bi gotina 'çawa ew mîrzade ya. Ji male kê ya. Ka ji min re bêja.' Piştî wê mêhvan gotina xwe domandin û wusa ji wî re hanî ser ziman.

Mîr di wê demê de ku ew li zembîlfiroş dihizirî wî hemû dem û pêvajoyên pêşî ku ew çawa hevnasîn bi xanima wî re kirîya li wê, dihizirî. Hemû weke dîmenna li dûv hevdû di mejiyê xwe de di berçavên xwe re derbas dikir. Bi hevdû ve girêdayî wî dixwest ku ew manayekê bi hevdû re bidiyê de.

Lê mîr di wê demê de gelek tiştên ku ew ne dizanî hebûn. Di wê demê de wê, wê rewşê de wê, xwe bide hiştin. Wê, di rewşek hizirkirinê de wê bêlî ku ew xew çavên wî bigirin wê di mejiyê xwe de wê bihizirê.

Mîr di wê şevê de wê, şevê ne asayî derbas dikir. Wî, di xwe de ew hîs dikir. Di wê demê de wî ew didît. Lê gelek tiştên ku wî didîtîn hinek ji wan bi şaşî ew bi wî hatina bi zanînkirin hebûn. Minaq weke rewşa gûlê xatûnê ku qerwaşê bi derwekê weke ku wê bi wî dabûbû zanînkirin. Ev hemû di serê mîr de bûn.

Mîr di wê rewşê de wê, rewşa zembîlfiroş ji aliyê ve û ya li holê nebûna Gûlê xatûnê ji aliyê ve wê bi wê rengê wê di mejiyê xwe de wê li wê bihizirê. Wê, hewlbide ku ew fahmbikê. Lê di wê demê de wê bi zêdeyî wê rewşa zembîlfiroş wê weke ku wê ew wî bide hizirkirin. Wê di serê wî de wê, heya wî weke hemû dem bi dem diçû ser wî. Lê mîr di wê demê de çî hatibû serê zembîlfiroş xanima wî jî wî ne dizanî. Weke ku hinek tevnekê li wî bi hûnin ew lê hatibû û ti kesek heya ti kesekê ji hevdû nebû, çendî ku wê hemû bi hevdû ve girêdayî jî ban.

Di wê rewşê de wê, rewşa Gûlê xatûnê û ya dilê wê ku heya mîr û ti kesekê jê neyî hebû. Rewşa zembîlfiroş û xatûna wî ya li qasrê hatibû hapiskirin ji aliyekê din ve hebû. Wekî din jî rewşên weke derewa qerwaşê jî wê, ji aliyekê din ve jî hebûn. Hemû rewş bi hevdû ve girêdayî bin di nava rewşekê û tevnekê de. Lê ji aliyekê din ve jî wê ji aliyê hişmendî ve wê ji hevdû bêzanîn bin.

Bêgûman ku mîr heya wî ji wan rewşan bû wê, belkî qiyemet wê biqatihê. Di wê demê de weke ku ya ku ew li hemû rewşan serwer û weke ji hemûyan xwedî nerînek giştî di derbarê hemû rewşan de wê qerwaş Gûlê xatûnê bê. Di wê temenê de wê, ev jî wê, di wê rengê de

wê, weke rewşna ku wê, di wê demê de wê, weke ku wê di xwest ku ew wan bi hevdû re îdera bikê.

Lê wê jî dizanî ku mîr pêhisiya ba wê, bo wê jî ne baş bûba. Di wê rengê de wê gelek rewş bi hevdû ve girêdayî lê ji hevdû bêxaber wê hebûban û wê bihatan jîyankirin.

....o0o....

Qerwaşê piştî ku ew demekê li balqonê dimênê û weke ku ew hinekî bêhn distênê di wê derengîya sevê de wê, were hundir. Gelek tiştên ku ew li wê hizirîya ban di serê wê de hebûn. Ji aliyekê din ve jî wê hişê wê li ser mîr bê ku ew nûha çî dikê De ne, mîr heta ku ew ne ghiştina Gûlê xatûnê wê weke ku ew ne rehet bûba. Wê jî Qerwaşê dizanî. Ji aliyê din ve wê, tevna ku wê bi Gûlê Xatûnê û zembîlfiroş hûnayî di nava wê de rewşa wan çî bû ew jî ji aliyekê din ve mereqa wê diafirand.

Lê heya wê, di serê wê de dem bi dem diçû ser jina zembîlfiroş ku ew nûha girtî dihat ragirtin di qasrê de jî heya wê di bîr ser xwe. Di serî de ku ji aliyên din ve jî ti kesekê heya wan ji rewşên din nebûba jî wê jina zembîlfiroş wê, bi hêrsa ku ew hatî girtîkirin wê ew wê hanîba ser ziman. Wê hingî wê çî bikira. Di wê rewşê de wê, ev rewş jî wê ji aliyekê din ve wê temenê ne rehetiyekê ba di ser û dilê wê de.

Lê qerwaşê weke jineka ku wê demên xwe yên jîyane hema bêja hemû li qasrê derbaskirina wê, rewşa jina zembîlfiroş ku ew ji ew jineka ji dora qasra mîrê bota hatibû bû wê dizanî. Jineka bi wê rengê wê ji xwe fihêt ba û wê, ne hiştiba ku ew navê wê bi tiştêkê din re derketiba. Di wê rengê de wê, ew wê, di xwe de bihişt. Qerwaşê hinekî li wê dihizirî. Lê di wê rewşê de wê, gelek aliyên rewşê ku wê, di bin nepeniyê de bin hebûn. Minaq wê, piştî ku ew hat berdan wê çî ji mîrê xwe zembîlfiroş re wê bigota. Di wê demê de ku mîrê ew dît wê ji wê bipirsîya ku ew li kûdeverê bû. Wê çî ji wan re wê bigota. Di wê demê de wê, ji wê re tenê careyek hebûba ku ew tenê rastiyê bi lêvbikê û bènê ser ziman bê.

Di wê demê de wê jina zembîlfiroş wê, di serê wê de wê ti tiştên din nebûn ku ew ji wê û pê de ku ew ji mîrê xwe re bigota. Hinekî jî weke jinekê qerwaşê ev ali hemû di serê xwe tasawûr dikirin û aqil bi wan dimeşand di serê xwe de. Di wê temenê de ew wê weke aliyekê wê yê din jî wê di wê rewşê de wê bi wê bihizirîya. Di wê rengê de wê, rewşa jina zembîlfiroş wê ji aliyekê din ve jî weke aliyekê giring ku wê mejiyê qerwaşê wê pirr meşkul bikira. Ber ku wê di wê dema ku ew derket wê, di wê demê de wê, hemû tişt wê piştê wê biheta zanîn. Di wê demê de

wê, di wê rengê de wê, êdî wê, di tiştên ku wan biikira wê nebûba. Ew hinekî li wê hizirî. Heta ku ew di wê zindanê de ku ew wê bikujê jî li wê hizirî. Lê qerwaşê piştre li wê hizirkir ku ew ne çareyek bû. Ber ku ew jî jineka ji aliyê malîbava xwe ve jî digihişt mîran. Çendê ku ew di serê xwe dihizirî ku ew gihiştibûba avdalekê weke zembîlfiroş jî. Di wê temenê de wê, bi wê rengê wê li wê dihizirî.

Qerwaşê di wê demê de wê çendî ku ew dihizirî û di nava hizirkirinên xwe de kûr û dûr zêdetirî diçû ew zêdetirî di xwe de bêaram dibû. Wê, di xwe de ne rehetî zêdetirî wê hîs dikir. Wê, di wê demê de wê, hertimî ku ew li cem Gûlê xatûnê ku ew ji her rewşê û gotinê re weke bersivek wê ya amede ku ew hebû di serê wê de lê di wê demê de ew weke ku mejiyê wê sekinî bû. Di wê demê de wê ne dikarî ku ew çareyek rast ku ew ji hemû aliyên rewşê re bibê çareserî wê di serê xwe de ne dikarî wê bibînê.

Piştî ku qerwaş ji balqonê hatibû hundir wê bi awayekê dizîka wê weke ku ew berê hingi çawa hatibû ber devê deriyê odaya rûniştinê a mîr û gûlê xatûnê û wê ji derve lê hisandibû bi wê rengê ew carekê hatibû devê deriyê devera ku jina zembîlfiroş di wir de dihat ragirtin jî. Di wê demê de wê lê hisand. Dibê ku jina zembîlfiroş ew hîskiribê ku ew hatibû aliyê din ê dêrî. Lê wê di wê demê de wê di nava bêdengiyekê de girtibû. Ew jî ji aliyê xwe dihizirî di wê demê de.

Wê hizir dikir ku ew çi rewş bû ew ketibûyê de. Ew ber çi di wê rewşê de ew hatibû girtin wê ew li wê dihizirî. Di wê temenê de wê, di awayekê de wê, di mejiyê xwe de wê, di xwest ku ew ji aliyê xwe ew pêşî rewşê fahmbikê. Ew jî jineka xwanda û pirr zêde bi zane bû.

Lê di wê demê de wê bi zêdeyî wê hiş wê li ser zaroyên wê bê. Ku wan dayîka xwe ne dîtî wê çi bikira. Wê kê xwarina çêbikira û danîba ber wan? Di wê demê de zilemê wê zembîlfiroş ku wê pirr zêde hêjê dikir û zembîlfiroş jî gelekî hêj wê dikir ew nûha çi dikir. Ew li wan dihizir.

Dem di wê demê de wê, bi wê rengê wê bo jina Zembîlfiroş derbas bûba. Lê jina zembîlfiroş ne jineka nezane bû. Ber ku vê yekê wê li şûna ku ew bertekên bêwate bide nîşandin û biqêrê li hewirdorê wê di serê xwe de hizir dikir ku ew pêşî rewşê fahmbikê. Ev çi bû hatibû serê wê û ber çi hatibû serê wê ew wê li wê dihizir. Di wê demê de wê, weke aliyekê wê yê giring wê, serê xwe li wê diêşand.

Di wê demê de wê, devera ku ew di wê de dihat ragirtin. Weke deverek kûr bû û ku tiştêk jî bi labitiya wê deng wê derxista. Wê weke di rewşek dengvegerinê de wê, deng wê derketiba.

Jina zembîlfiroş ji roja ku ew hatibûbûna wir wê, di awayekê de wê pêşî Gûlê xatûnê wê weke ku ew wê bikê azmûnekê de wê, bi gelek pirsan wê bixwezê ku ew fahmbikê ku ew çendî bi zane bû wê, herê bi ser wê de. Gelek rewşên ku wê, bèn derxistin li pêşîya wê, hemûyan jî wê jina zembîlfiroş wê bi aqilzanîya xwe û birewerîya xwe ya mazin wê bi ser wan ve wê were. Wê jî bû sedema ku wê di derbarê wê de wê di serê qerwaşê de jî û di serê Gûlê xatûnê de jî wê, fahmbikin ku ew çendî kesek û jinek bi zane ya.

Di wê temenê de wê, qerwaş ew hinekî li wê rewşê di serê xwe de hizirîya. Di wê rewşê de wê, hewlda ku ew fahmbikê ku ew di rewşek mihtemel a ku ew jina zembîlfiroş serbest berdîn de wê, ew wê, çî bikê û wê çawa wê bertekê wê bide nîşandin. Di aslê xwe de wê qerwaşê di wê demê de wê, bi zêdeyî wê, ne dikarî wê, pêşbînî ku wê çawa rastî bertekna wê werin ji aliyê wê ve.

Wusa demek dirêj qerwaş di serê xwe de çû û hat. Ku jina zembîlfiroş li wê newê rahmê bêgûman wê, ew di nava rewşek pîrr zêde xirab de bû. Lê rewşa ku wê hanîbû serê wê jî ku wê ji aliyê xwe dixwend weke rewşek pîrr bi nîyetek xirab dihat dîtîn.

Di wê rewşê de wê, di wê rewşê de ku wê jina zembîlfiroş ku ew bihizirê ku ew bi wê rengê bi nîyetek xirab ew li wir girtiya û ku ew hê sedema wê di serê xwe de nizanê ber çî ya wê, di wê demê de wê, çî bertekê wê bide nîşandin ew li wê dihizirî. Ev weke rewşeka ku qerwaş bi wê re rû bi rû hatiba li pêşîya wê disekinî. Çî encamên wê bûba jî wê ew pêşwazî bikira. Ew li wê dihizirî.

Ya ku wê ji wî serî dibir wî şerî û ji wî serî jî dihanî vî serî ev bû. Ew li wê dihizirî. Di wê demê de ew wê weke aliyekê wê yê din ê ku ew di serî de li wê dihizirî bê.

Jina zembîlfiroş di wê demê de wê herî zêde wê, ji ber ku ew hişê wê li male wê bû wê, ne dikarî ew rehet bibê. Ji xwe di rewşek bi wê rengê de ne bi derfet jî bû ku ew xewê çavên wê bigirê. Di wê rengê de ew di rewşekê de di halê xwe de disekinê. Gelek tişt û pirs di serê wê de afirîbûn û rûdabûn ku ew li wan bihizirê. Wekî din ku ew çû malê wê dema ku ew wê şevê ne li malê bê wê çawa wê bi heta pêşwazîkirin? Ew li wê jî dihizirî. Ber ku wê ji wê were pirsîn ku ew li kûderê bû. Wê demê ew jî wê, tenê pêwîst bê ku ew rastiye bêjê. Di wê demê de wê, ji ber çî wê ew wê were hanîn li serê wê, ji xwe wê weke aliyekê din ku wê li bihê hizirkirin bê. Wekî din wê piştî wê rewşê êdî ew dihizirî ku ew nedikarin ku ew li wir li cem qasrê li nêzî mîr jî biman. Di wê rewşê de

wê, ew jî mecbûr ban ku ew ji wir jî çûban. Wê jî ew li wê dihizirî. Di wê rengê de wê, gelek tişt û rewşên ku wê di demên piştî wê rewşê de ku wê derketan li pêşîya wan ew li wê dihizirî di serê xwe de.

...o0o...

Rewşa jina zembîlfiroş a di girtîbûna wê de wê, pîrr zêde wê, serê qerwaşa Gêlê xatûnê meşkul dikir. Di wê temenê de wê, ew wê çî biikira û wê çawa bikira wê, di aslê xwe de wê weke aliyekê wê yê din ba.

Di wê demê de wê, çend caran qerwaşê li xwe hanî ku ew herê cem jina zembîlfiroş û bi wê re biaxifê. Lê wê, di wê rewşê de wê, ew di xwe re ne dît. Di wê demê de wê, nizanîbû ku wê ew çî bikê ji wê rewşê. Ku mîr bi wê bihisiya wê ji zembîlfiroş zêdetirî wê, bertekna hişk wê li wan daba nîşandin. Wan jî ew dizanî. Di wê rewşê de wê, dema ku qerwaşê li wê dihizirî wê, di wê demê de wê, ne xwest êdî li wê jî bihizirê.

Piştî ku ew hinekî li wê hizirî û wê fahmkir ku ew ji nava mijarê dernekeve bi tenê di serê xwe de wê, êdî di wê demê de dev ji hizirkirina li wê berda. Wê di serê xwe de wê weke ku biryar da ku ew li bendî Gûlê Xatûnê bê û ew bi hevdû re li ser wê mijarê bi hizirin û wê bikin.

Ji xwe ew li xoşa qerwaşê jî dihat. Ber ku wê di wê rewşê de wê, hemû rewş li ser gûlê xatûnê wê maba. Wê hingî wê ew jî wê weke kesek qerwaş ku ew di gotina xatûna xwe de yî wê, biheta dîtî û wê, di wê rewşê de wê ti kesekê wê hizir nekiriba ku wê ew kiriya.

Ew rengê hizirkirinê weke renekê masûmane wê, di mejiyê wê de wê xwe bide dîyarkirin. Di wê rewşê de wê, di wê rengê de wê weke ku xwe berda. Ti tişt nekir. Lê ji aliyekê din ve jî ber re dihizirî ku ew di wê navberê de hizirekê û ankû rêyek baştir di serê xwe de bibîne.

Di wê demê de wê, rewş wê hinekî din wê weke ku wê tevlihev bibê. Di wê demê de wê, di qasrê xwe de wê weke ku wê rewşek ku wê hema bêja herkesek wê di nava wê de bê rûdabû û hem jî wê weke ku heya ti kesekî ji ti kesekî nebê jî wê di nava wê rewşê de wê awayekê wê jî were dîtî.

Di wê mijarê de wê rewşa jina zembîlfiroş û ya Gûlê xatûnê wê bi zêdeyî wê weke du rewşên teybet ên wê mijarê bin. Di wê temenê de wê, çawa wê, ew wê were fahmkirin dema ku ew hatina bihîstin wê, di aslê xwe de wê, ew jî wê weke aliyekê din bê. Lê di wê demê de wê, ji zêdetirî wê rewşa Gûlê xatûnê ku ew di wê de bû wê, were li berçav.

De ne, pêşîya gotiya ku destpêkek hat kirin wê li dûv wê li wê hûnandin wê di dewama wê de wê were. Di rewşa wan jî weke ku ya bûbû ev bû û

ji wê ne cûdatir bû. Ber vê yekê wê demê wê çî bû ba wê, di wê rewşê de wê, hemû bi hevdû ve girêdayî bê.

Gûlê xatûnê wê, di wê demê de ew di malê zembîlfiroş de û di rola jina wî de derbas dikê. Wê bi wî û zaroyên wî re wê, demekê derbas bikê. Lê di wê rewşê de wê, ew jî wê di nava wan de wê heya wan wê ji hevdû wê nebê.

Gûlê xatûnê wê rewşa ku wê xwe xistibûyê de ew di wê demê de wê ne dizanî ku ew wê çawa xwe ji wê xilasbikê. Di wê rewşê de wê, weke çareya ku wê di serê xwe dîtîbû ku ew tenê xwe li ahenge rewşê berdê bê. Lê wê jî dizanî ku wê, di nava malekê de wê, kêzêde wê, çawa wê, tişt bibin û wê derkevina li hemberî wê. Di wê rengê de wê, jî wê xwe di wê rewşê de wê, li wê dihizirî. Wê demek di dirêj wê, Gûlê Xatûnê wê, di wê rewşê de wê, bi zaroyan weke rûgirtî û serpêçayî wê, dema xwe derbas bikê.

Zembîlfiroş wê dema ku ew hatibû malê wê piştî ku wî hinek xwarin xwaribû û pê de ew li cihê xwe yê rûniştinê rûniştibû ketibû nava hazn, mitale û fikaran ku wan ew di nava xwe de dût û kûr biribû bû. Wî di wê demê de wê, weke ku ew jî heya wî ji tiştê nebê bû.

Ji xwe tiştê ku ew di male wî de di qawimî di wê demê de heya wî ji wê nebû. Di wê demê de wê, di wê rewşê de wê, weke aliyekê wê ew li wê dihizirê. Demek hinekî têve çû û ku Gûlê Xatûnê weke dayika zaroka ku wê xwe kirî li şûna wê de ku wê zarok dana razandin û ne hişt ku zaro tiştê tê derxin û pê de wê jî xwe da kêlekekê ku ew hinekî ji zembîlfiroş dût û rûniştibû bû. Di wê demê de ew jî di serê xwe de ew pirr zêde bi hazn û hizir bû.

Wê, di wê demê de wê, piştî ku wê demek têve çû wê, weke dema razanê wê were û wê, di wê rewşê de wê, êdî wê, zembîlfiroş wê xwe ji cihê xwe wê bilabitênê. Ev labitandin û xwe ji hevdû kişandin û vezilendin dihat wê wateyê ku êdî xewa me dihêt em êdî herin ser cihê xwe yê razanê û rahizin bû.

Dema ku wê Gûlê xatûnê bikeve nivîna Zembîlfiroş ..

Di nava zembîlfiroş de wê rewş weke ku wê ji xwe ti tişt neyî wê di awayekê asayî de wê hikme xwe wê bi rêve bibê. Wê di wê rewşê de wê zêdeyî wê heya wan weke ku ew ji tiştê nebê. Gûlê Xatûnê heta wê demê bêî ku ti kesek heya wan ji tiştê bibê wê hanî bû. Wê zarok têrkiribûn û ew li ser nivînên wan razandibûn. Piştî ew hatibû li cihê jina zembîlfiroş weke jina wî rûniştibû.

Lê di wê demê de dilê wî jî dikira kûtakût. Dilê wê pîrr zêde bilêz û xort lê dida. Wê jî dengê lêdana dilê xwe dibê ku wê dikir. Lê wê di xwe de dikir ku ew hertiştî di awayekê awayî de ew bi rê ve bibê.

Aqilê Gûlê Xatûnê di wê demê de li male wê bû. Ka nûha mîr çi dikê? Dibê ku mîr gelek kes li pey wê derxistin û li wê jî digerîyan bin. Ev jî di ber hişê wê re derbas bû. Lê heta wê demê ti deng û rewşên weke wê rûnedabû bûn.

Gûlê Xatûnê piştî ku Zembîlfiroş xwe ji cihê xwe labitandibû wê, fahmkiribû ew dihat çi wateyê wê. Di wê rewşê de wê, weke ku ew ti tişt nebûyî di asayîya xwe de wê tevgerîya û wê, di wê demê de wê cihê xwe danîn.

Lê di wê demê de tiştek bi farqî hebû û Zembîlfiroş ji haznên di serê xwe de wî ew farq nekiribû. Di her demê de wê, jina wî were niq we rûnihê û wê bi hevdû re wê biaxifin. Carna wê bi xwe hin gotin ji wî re gotin ku ew heya wî bânê ser xwe. Carna jî wê gotinna bi henekok wê bibêjê. Wê bi wê rengê wê bi hevdû re wê henekan wê bikiran. Lê di wê demê de dibê ku gelek tiştina pîrr zêde mazin di serê wî de hebin ku ew wilqasî ji xwe çûbû bû.

Gûlê xatûnê li rêdêna zembîlfiroş dinerî û di xwe de dihizirî û digot ku “gelo ev zilem hertimî bi vê rengê bêdeng a. Ew zêde ne peyvê. Ew demek dirêj a ku ew tenê li cihê xwe di awayekê bêdeng de rûniştiya.

Wusa wê ji xwe re got. Lê piştê wê, dema ku wê, dema razana wan hat. Zembîlfiroş bixwe gotinên ‘dê êdî em razihin. Çaxê razanê hatîya’ û hwd wê bânê ser ziman. Lê di wê demê de deng ji gûlê Xatûna ku weke jina wî li cem wî tevgeriya dernediket. Wê tenê wê bi tiştekê ve xwe mijul dikir. Dikir ku ew heya wê heya wê li ser wê tiştê bê ku ew newina çav bi çav li hevdû û ankû mecbûr nemênê ku ew biaxifê.

Bo wê yekê jî wê Gûlê Xatûnê wê pîrr zêde wê, di nava kêferatek mazin de bê. Di dawîya dawî de wê, weke ku wê heta wê demê û kêlîkê wê, di wê rewşê de wê, tevbigerihe. Piştî ku wê cihê xwe danîn êdî ew mecbûr bû ku ew weke jina wî bo ku ew newê farqkirin ew bi wî re bikeve nava nivînan de.

Di wê demê de wê ew jî kir. Piştî ku Zembîlfiroş dest û rûyên xwe şîştin û xwe paqij û zûwa kir û pê de wê, were û xwe bikeve nava nivînan de. Di wê rewşê de êdî wan çirayên xwe jî mivirandin. Di wê rewşê de wê, Gûlê Xatûnê jî wê, cilên xwe yên li ser xwe wê hinekan ji xwe bikê û wê li nava nivînê wê xwe li rex Zembîlfiroş wê dirêj bikê. Di wê demê de wê, zembîlfiroş wê zanbikê ku ew jina wî ya û wê destê biavêjê ser noqa

wê û wê li wê himbêz bikê. Di wê demê de Gûlê Xatûnê ti deng nekir û xwe weke ji wî re berda. Êdî çî bûba wê bûba.

Di wê demê de wê, zembîlfiroş lingên xwe digihênê li ber lingên wê û ew dirêj dikê. Ew dema ku ew wusa dikê wê lingên wî li lingên wê bikevin. Dema ku wê lingên wê li lingên wê bikevin wê hingî wê, lingên zembîlfiroş wê li xirxalên di lingên wê de na wê li wan bikeve. Di wê demê de wê, wê pîrr zêde bale wî kişand. Zembîlfiroş weke ku barqek li mejiyê wî bixê lê dihêt. Di wê demê de ew di cih de ji nava nivînê dirabê û li ser xwe dirûnihê û dibêjê “ne tû xirxalan di lingên xwe bikarnayênê” û di wê demê de ew dibajê û çirayê pêdixê. Di wê demê de ew dema ku ew li rûyê wê dinerê wê, hingî wê ew bi rûyê Gûlê Xatûnê re rû bi rû wê were. Di wê demê de wê ew wê, ne tenê wê şaş û mat wê bimênê wê pîrr zêde wê acêbmayî jî wê bimênê. Pêşî Zembîlfiroş wê, bi wê bawer nekê.. Wê zan bikê ku ew çavên wî şaş dibînin û ankû ew bi şiyarî xewnê dibîne. Lê di wê demê de ew piştê ne bi gelekî re fahmdikê ku ew bi rastî jî ew Gûlê xatûnê ya. Êdî Zembîlfiroş wê bi qêrînê wê xwe ji şebekeyê ve wê xwe biavêjê derve. Di wê demê de wê, li wê aliyê ku wî xwe li wê avêt wê weke aliyê beravê û wê, ava diclê wê di ber re diherikî bû ba.

Piştî ku zembîlfiroş xwe avêt derve wê êdî tevî nebûnan dibê. Ew êdî winda dibê ji berçav. Wê ew weke herê deverekê ku wê ti kesekê bikaribê wî nebîne. Gûlê xatûnê ew tenê li malê dimênê û di wê demê de ew weke ku ew dikeve rewşek awarta de di xwe de. Ew di destpêkê de ew nizanê ku wê çî bikê. Di wê demê de ew di cih de dikê ku ew xwe li hev bide hevdû. Ew pêşî ya ku ew pêşî dihê hişê wê ew bê ku ew cilên xwe yên ku wê ji xwe kirina ew wan cardin bikişênê li ser xwe û li xwe bikê.

Piştî ku wê ew kir û pê de wê, di cih de wê, were nivê malê. Di wê demê de çavekê wê li devê dêrîya ku ew hema xwe biavêjê devê dêrî. Çavekê wê li aliyê zaroyan ku ew dirazihin bê û ji aliyê din ve jî wê çavekê wê li şebeka ku zembîlfiroş xwe di wê de avêt derve bê.

Wusa demekê bi şaşbûn, matbûn û dilwaswasbûnên ku ew bi hevdû re dijî wê dema xwe derbas bikê. Piştê ew di cih de xwe diavêjê derve. Piştî ku wê xwe avêt devê dêrî wê pêşî li devê dêrî nerî ku ka kes hena û ankû nîn in. Li ser qêra zembîlfiroş zarok jî wê pêşî zankir ku ew şiyarbûna. Lê ew şiyar nebûbûn. Lê di wê rewşê de ma wê were aqil û hişê kê ku ew li zaroyan bihizirê û wan werênê li bîra xwe.

Gûlê xatûnê wê di wê demê de wê li deverek ku wê ti kesek wê nebînê re wê xwe biavêjê hundirê qasrê. Di wê demê de ew dema ku ew dihê qasrê wê pêşî wê neçê odaya xwe ya razanê. Di wê demê de mîr li odaya. Dibê ku ew razahî bê û di xewê ve çûbê. Wusa çû ber dilê wê. Lê Gûlê xatûnê ew hê di bin bandûra wê rewşa ku wê bi zembîlfiroş re jîyankir de bû. Hê jî weke ku ew li berçavên wê bû. Hê weke ku ew ne hatibû li xwe. Lê piştî ku ew hat hundirê qasrê wê di cih de wê, rastî qerwaşa xwe wê were. Qerwaş di wê demê de ew xew ne ketibû çavên wî û hadan û qarana wê ne hatibû. Ew hertimî weke li ser êgir bê diçû û dihat.

Dema ku ew rastî hevdû hatin wê, demê Gûlê xatûnê bi awirek hişk li qerwaşa nerî. Lê di wê demê de gotin ji devên wê derneket. Qerwaşa wê tenê bi dengên weke 'xatûna min a delal bi sax û selim ghişt male xwe.' Gûlê xatûnê dengê wê kir lê weke ku wê deng nekiri tevgerîya.

Gûlê xatûn ew piştî ku ew hatibû hundir wê, di cih de wê ji aliyê qerwaşa wê ve wê, ew bir li deverek tenha û ku wê xwest ku ew bi tenê bimênê bi wê re. Qerwaş weke ku ew derdê wê ne Gûlê xatûnê bê. Wê, di serî de wê dema ku wê ew bira deverek ku ew di wê de bi tenê man. Qerwaşa wê, kir ku ew biaxifê li wê. Lê Gûlê xatûnê wê bi gotina 'dêka hinekî bisekine. Ez hinekê bêhnê bistênim. Ez pêşî hinekî bi ser xwe ve herim.' Li ser wê gotina Gûlê xatûnê tenê qerwaşê got 'bila xatûna min a delal' û ma sekinî. Lê bi awirên ku wê hîç ji ser wê ne birrîn li wê dinerî.

Piştî demekê ku ew weke ku ew bi ser xwe ve hatin êdî bi hevdû re bidest axiftinê kirin. Li şûna ku wê qerwaş pêşî bipirsê ku çibû xatûna min wê, xwest ku ew pêşî ji Gûlê xatûnê re bêjê ku ew rastî mîr hatîya û wê çî ji mîr re gotiya bo wê, ew wê ji wê re wê bîne ser ziman ku ew weke wê biaxifê. Bo ku ew derewa wê dernekeve li holê wê, pêşî li wê dihizirî. Dema ku qerwaşê bidest axiftinê kir wê, Gûlê xatûnê bi çavna raq wê li wê binerê, bêî ku ew ti gotinê li hemberî wê bibêjê. Piştî ku qerwaşê gotinên xwe ên di derbarê danûstandina xwe bi mîr re bidawî kir û pê de wê, Gûlê xatûnê bidest axiftinê kir. Gûlê xatûnê dema ku wê xwe amede kir ku ew ji wê re biaxifê û qerwaşê dema ku wê dît ku Gûlê xatûnê xwe amede dikê biaxifê wê, zan kir ku wê bahsa mîr û rewşa wê bikê. Gûlê xatûnê, bêî ku ew ti gotinê bêjê rastarast bi gotina 'jina zembîlfiroş li kû tê ragirtin. Min di cih de bibe cem wê.' Bi vê gotinê qerwaş weke ku ew hinekî şaş û mat ma. Ber ku ew li bendê bû ku ew pêşî mîr bipirsê û pêşî bixwezê herê odaya xwe weke ku ew ti tişt nebûyî. Lê wê ew nekir. Di cih de wê, dema ku wusa weke ferman bide ku wê berê xwe qerwaşê û got êdî qerwaşê di cih de ji cihê xwe rabû û got 'bila

xatûna min, were ez te bibim cem wê.’ Piştre bi hevdû re ji wir rabûn û bidest meşînê kirin. Dema ku ew dihatina ber devera ku jina zembîlfiroş di wir de dihat ragirtin Gûlê Xatûnê pîrr bi hazn bû. Weke ku wê tişteke mazin kirî bihazn bû.

Qerwaşe dem bi dem awirên xwe dibirina ser wê û di xwe de ku ew rûdêna wê bibînê ku ew di çi rewşê de ya. Di wê rewşê de wê, di xwest ku ew rûyê wê bibînê. Lê ber ku Gûlê xatûnê hinekî li pêş wê di meşî êdî wê bo wê zor bûba ku ew rastarast rûyê wê bibînê. Tenê wê hinerîka rûyê yê xweşik wê ku ew hinekî weke sor û warimî didît.

Ku ew hinekî bi wê rengê di awa û rewşek bêdeng de ew hatina ber deriyê devera ku jina zembîlfiroş di wê de dihat ragirtin mana sekinê. Dema ku ew mana sekinî pêşî Gûlê Xatûnê hizirî. Weke ku ew pêşê bihizirê ku wê çi bi wê re bipeuvê wê di serê xwe de birûhanî. Di wê demê dema ku ew çûna hundir wê, qerwaşa wê jî wê bi wê re wê xwe amede bikê ku ew dema ku derî vekir ew jî bi wê re herê hundir. Gûlê Xatûnê ew fahmkir. Ber vê yekê Gûlê xatûnê berî ku ew derî vekê wê, berê xwe da qerwaşa xwe û gotiyê de ‘tu li vir li bendî min bisekinê.’ Ezê bi tenê herim û bi wê re bipeyvîm.’ Qerwaşê bi çav û awirna şaş û matmayî piştî wê gotinê li nava rûyê wê nerî. Lê wê ti tişt negot ji biligî gotina ‘bila xatûna min çawa di xwezê ..’ û pê ve. Piştre ew hinekî din li wir mana sekinî. Di dawiyê de Gûlê xatûnê li qerwaşa xwe nerî weke ku ew bêjiyê dê êdî derî veke. Wê jî wusa kir. Piştî ku derî vekir. Gûlê xatûnê milkên xiftanê xwe pêşî bi hevdû ve girêdan û avêtina piştî şûkra xwe. Aliyê xiftanê wê ê weke pêşmalê ku ew dirêj dibû wê ew kişand û keviya wê kir ber aliyê girêdana tihêla xwe ya çapê de. Piştre wê, ku xwe amede kir û çû cem jina zembîlfiroş.

Dema ku gûlê xatûnê ket hundir ew pêşî bi awirên jina zembîlfiroş ên hişk re berember hev hat. Di wê demê de Gûlê xatûnê bo ku ew rewşê weke ku ew dixwezê nerm bikê heta ji wê hat wê nerîn û awirên xwe nerm û di rewşek dilgermî de kir ku ew bide nîşandin.

Piştî ku ew çû hundir û pê de wê, Gûlê xatûnê wê her cem wê û wê, pêşî silevê wê bidiyê de. Tiştî ku pêşî ew hatibû hişê wê û aqilê wê ew bû di wê heyemê de.

Piştî ku wê wusa silev da jina zembîlfiroş wê, ti sileva wê bi dengî ne hilda. Tenê ew hinekê li nava çavên wê bi awirêkê nerî weke bêjê temem ji sileve wê re. Piştre Gûlê xatûnê li deverê ku ew li wê rûniştî weke somyakê ku jina zembîlfiroş li aliyekê rûniştî bû wê jî got ‘ez dikarim li vir li rex te rûnihim, destûrê dide min?.’ Dema ku wê jina zembîlfiroş

tenê bi awirek weke bêjê temem lê nerî gûlê xatûnê jî ew fahmkir ji wê awira wê û êdî ew li rex wê rûnişt.

Gûlê xatûnê jinek bi xwe bawer, li xwe hatî û bilind bû. Biqasî xweşikatiya wê, xûyê wê jî wê bi wê rengê hertimî xweşikatiyek tevî wê endama wê dikir. Piştî ku Gûlê xatûnê rûnişt pêşî Gûlê xatûnê hinekî bêdeng ma. Piştê berê xwe da jina zembîlfiroş û pêşî ji wê lêborîna xwe xwest ku evqas tiştên ku ew hatina serê wê. Ji wê re got ku ev di aqilê wê de nebû ku ew bûba. Lê Gûlê xatûnê xatûnê ji destpêka ku ew rastî zembîlfiroş hatiya û çawa wî di dilê wê de cihgirtîya wê hemû weke xwe û bi gotinên xwe ji jina zembîlfiroş re hanî ser ziman. Ji wê re got ku wê çendî ku wê xwe nêzî wî kir û wî hertimî ji wê re gotiha ku ew ..mirovek tobadar, zewicî û bi zaroya.' Di wê rewşê de wê, jina zembîlfiroş bi bi hemû gûhê xwe re li wê dihisand.

Gûlê xatûnê weke ta bi derziyê ve bikê hemû tişt ji wê re yek bi yek hanî ser ziman. Wê rewşa ku ew di wê de û piştê ketina dewşa wê de jî wê ji wê re bilêvkir û hanî ser ziman. Wê dema ku wê bahsa wê kir jina zembîlfiroş pirr zêde bi awirên hişk û zaxwadar li wê dinerî û pirr hêrsî ji awirên wê dihat dîtin. Piştê di serê her gotina xwe de Gûlê xatûnê wê, ji jina zembîlfiroş re wê bêjê ku tu weke xwûşka min î û hêvî rica dikim ku tu min fahmbikê. Lê jina zembîlfiroş weke ku wê, ti tişt wê ji wê hêrsa weke ku wê nehanîyaba xwerê. Wusa di rewşekê de li wê dinerî.

Lê dema ku Gûlê xatûnê wê bahsa ketina nava nivîna mêrê wê kiribş û piştê wî fahmkiribû ku ew ne jina wî ya ku wî qêrînî dabû û xwe di şebekeyê de avêtibû derve ku ew li wê dihizirî wê, wusa mereq dikir ku ew çû ya kûderê. Dibê ku ew êdî li ti deverê newê dîtin. Lê Jina zembîlfiroş piştî ku ew hinekî li ser gotinên weke lava û lêborînê ji wê dixwezî ku ew dihizirê wê piştê hinekî bi zorekê bidest axiftinê kir li Gûlê xatûnê.

-Tu xatûna mîrê mayafarqînê yî. Tu çawa tişteke wusa dikê?

-Tu rast dibêjê, tu çî bêjê tu rastî. Mîn ne rastiyeke kir. Ez bi ya dilê xwe çûm û hingê çavên ti tişt nedît. Azwerîya min ez kor û bêçav kirim. Lê nûha çavên dilê min vebûn.

-Piştî vanqas bûyîn û kirinên ku ew di encama wê de hanîna serê me hemûyan. ..

-Rasta piştî vanqas kirin û bûyînên ku hatina serê me hemûyan. Ez te weke xwûşka qabûl dikim û hêvî û rica dikim ku tû jî weke xwûşkekê min afûbikê.

-Ez dikarim te afûbikim. Te dest avêt male min û zawaca min. ..

-Rasta. Lê ya dil ku ew bû ew ti kesekê na hisênê û li ti fermanê gûhdar nakê.. Ya min jî wusa bihasênê.

-Ez afû jî bikim, ma tê çawa bi vanqas kirinan êdî bijî? Êdî ev rewş wê di nava me hemûyan de wê weke bendekê bê. Mîr jî wê dema ku wî bihîst wê ne tenê bi ya ku te hanî serê me lê ya ku te kirî di nava te û wî de jî wê bê weke bendekê. ..

-Ew rast a. Lê ji nûha û pê de ezê hewlbidim ku hemû tiştî rastbikim.

-Ti nikarê rast bikê. Tiştê ku ew bû tu nikarê wê weke nebûyî wê bikê. Ti kesek nikarê wê ji demê û mejîyan bibê.

-Rast a, dibê ku ti kesek nikaribê wê ji demê û mejîyan bibê lê ez dikarim herî hindik wê tiştîna piçûk jî bin bikim. Ez hevî dikim ku em karibin hevdû fahmbikin.

-Em çiqasî hevdû fahmbikim jî te zerera mazin da min û male min. Mêrê min çû êdî kî dizanê ew li kû ya. Ez û zaroyên bi tenê li vê dûnyayê weke sêwîyên berîyan hişt. Derb li male min xist.

Gûlê xatûnê li ser wan gotinên wê pirr zêde di xwe de ew bi hizir bû. Weke ku ew êdî weke nişka ve ew bikeve farqe hinek tiştan de lê hat. Wê jî wê gelekî ew xamgin û bi dilêş kir. Di wê rewşê de wê ne dizanî ku ew çi bêjê û êdî çi bîênê ser ziman. Li hemberî wan gotinên jina zembîlfiroş ku weke ji dilê wê yê biêş hatina ser ziman weke ti gotina ne dikarî xwe ji nava lêvên sipahî ên Gûlê xatûnê bidina li der û werina ser ziman.

Gûlê xatûnê çi got û negot bo ku ew jina zembîlfiroş bîênê ser ya xwe û wê di gotina xwe de wê razî bikê jî lê weke ku wê ji wê re wê fêde nekê. Lê jina zembîlfiroş ew di gotina xwe de pirr bizane bû. Wê piştê wê, tenê li nava çavên wê nerî. Weke ku ew ji wê re bêjê meyizene rewşa ku te ez jî û xwe jî xistiyê de. Gûlê xatûnê ew ji awirên wê fahmkir weke ku ew mahçûp bibê serê xwe kir ber xwe û xamgîn bû.

Piştê jina zembîlfiroş tenê gotina ku ew ji devê wê derket wê, ji Gûlê xatûnê re got ku 'nûha destûra te hebê ez herima ba zaroyên xwe ku ew bi tenê mana bi saya serê te.' Gûlê xatûnê got 'destûr ya te ya' û êdî ew ji wir derket û bi lezekê çû male. Lê gûlê xatûnê ew piştî wê jî ew bêhnekê di bédengiyê de li şûna wê li cihê xwe rûniştî ma û hazinî. Piştî ku jina zembîlfiroş çû û pê de wê, qerwaş were hundir û wê bi dengê xatûna min a delal wê derkeve ji vir. Li ser wê gotinê weke ku ew ji xewnekê bi hilçênê lê hat û berê xwe da qerwaşê û hema di rewşek bédengî de ew bidest çûyinê dikê. Di wê rewşê de wê, ew ji wir derdikeve û êdî ew bidest çûyina odaya xwe ya rûniştinê dikê. Gûlê xatûnê pirr bi hazn û hizir bû. Wusa demek dirêj meşî. Qerwaşa wê jî li rex wê bû di wê

derengîya nivê şevê ku ew li hevdû di meşîn. Ku ew hevdû re hatina ber devê deriyê odaya wan a rûniştinê Gûlê xatûnê gota qerwaşa xwe 'tû here û razihî. Êdî dawî li şevê werêna. Qerwaş weke ku ew hinek tişt di serê wê de hebûn ku wê pîrr zêde dixwest bi wê re biaxifê hebûn. Lê wê ew ne pîrsîn. Gûlê xatûnê weke ku wê fahmbikê wê, got "îşev vilqas mihebbet bes a. Bila ya din jî ji siba re bimênê.

Gûlê xatûnê ku ew hat odaya rûniştinê ew pêşî hinekî li wir ma. Wê di serê xwe de wê, hizir kir li ser hemû rewşên ku ew di wê demê bûn. Wê pêşî di serê xwe de wê, çî bêjê ji mîr re wê hinekî li ser wê hizir kir. Lê wê, pêşî ne dizanî ku wê çî bibêjê. Wê di zanî ku ew rewş herê gûhê mîr wî pîrr zêde wî bihêrs û xamgin bikê. Ji xwe ew demek bû weke ku ew pîrr zêde di rewşek xamgin û hazn bû. Ber vê yekê wê, gûlê xatûnê pêşî li ser wê hizirî ku ew çî bikê.

Gûlê xatûnê wê, piştî di dawîya wê hizirkirina xwe de wê, hizir kir û di sserê xwe de hanî ser ziman ku mîr hebê nebê wê bigihê agahiya hemû tiştan. Ber vê yekê li şûna ku ew ji kesekê din bibîhîzê bila ew ji wê bibîhîzê. Ber vê yekê wê biryar da ku ew hemû tiştî ji wî re werênê ser ziman. Wê weke ya bi dûrûstayî ew dît di serê xwe de.

Piştî Gûlê xatûnê ji odaya rûniştinê wê berê xwe da odaya razanê. Dema ku ew çû odaya razanê wê mîr dît ku ew di nava nivînan de dirêj kirî ya. Pêşî wê zankir ku ew razahî ya. Lê mîr hê şiyar bû. Dema ku ew hat hundir wê demê mîr xwe li wê zivirand û bi wê re bidest axiftinê kir.

-Tu mayê pîrr bi dereng. Bihêvîma ku hemû tişt baş bê. Qerwaşê ji min re got ku tu li kûderê yî.

-Rasta mîrê min. Lê emê siba hemû tiştî bi mejiyekê rehet biaxifin. Ezê hemû hemû tiştî ji ter vebêjim.

-Temam, wê demê em nûha êdî razihin. Hindik maya ku li me bibê sibeh.

-Rasta mîrê min, sevek pîrr zêde dirêj û bi bûyar derbas bû.

Ji vê gotina Gûlê xatûnê mîr ya ku ew weke ji wî re hatî gotin wî fahmkiribû. Lê di serê Gûlê xatûnê de wê beremberê wê gotinê wê tiştekek din ku ew ne mîr dizanî û ne jî di hişê wî de bê wê hebê. Di wê rewşê de wê, di gotinekê de wê du rengên fahmkirinê êmn ji hev cûda wê hebin. Her yekê wê ji aliyê xwe ve wê bi wê binerîya û wê fahmbikira.

Piştî wê demê re wê, mîr xwe dirêj kir û Gûlê xatûnê jî wê xwe amede kir û ew jî ket nava nivînan de. Di wê demê de mîr piştî bi bêhnekê ew weke ku ew êdî bi rehetî di xewê ve çû. Lê Gûlê xatûnê wê şeve heta ku

ew li wê bû sibeh jî wê xewê çavên wê negirt. Wê li ser rewşên ku bûn li ser wan hizirîya. Ku bû sibeh û rohniya pêşî a sibehê serê xwe da der û derket û pê de êdî hin bi hin bidest hatina dengên ji qasrê û dervî qasrê hat.

De ne ku deng ji derve û ji hundirê qasrê dihatin wê, Gûlê xatûnê û mîr jî wê weke yên ku ew pêşî di rabûn û wê xweşîya sibehê de wê, derkevina derve û wê bêhn bihêstênin bi hevdû re. Her sibeh wê bi awayekê din wê xweşik bê. Her sibeh wê bi awayekê wê bi awayekê din wê bêhnfirehiyek din wê bide mirov û wê bikira dilê mirov de. Her sibeh wê, bi awayekê din wê, mirov bi xweşiyek bi xwe re wê pêşwazî bikira. ..

Piştî ku wê deng wê zêde bibin di hatina xwe de wê êdî mîr jî wê rabê. Dema ku ew rabû wî dît ku wa Gûlê xatûnê ji xwe ew şîyar a. Wê demê wî rojbaşî ji wê re kişand û gotiyê tu zûtirîn rabûyî. Gûlê xatûnê bersiva ku wê li ser wê re ji wê re got 'xewê çavên min negirt'. Piştî wê re ew ma sekinî. Mîr ji wê bersiva wê fahmkir ku ew hişê wê li ser wan kesên ku wê heta derengiya şevê alikariya daya wan ew hizirîya. Ber vê yekê wî ti tişt negot. Lê Gûlê xatûnê xwe kar kir ku ew bi wî re li ser mijar û meseleyên şevê din ku wê jîyankirina ew bi wî re biaxivê û rastiyê ji wî re vebêjê. Lê mîr xwest ku ew pêşî herin hinek deve û wê hewayaya paqij hinekî bi kişênina li kezebên xwe û piştîre taştêya xwe bi rehetî bikin êdî ew dikarin bi hevdû re biaxifin. Gûlê xatûnê xatûnê got bila û ma sekinê. Piştî ew bi hevdû re derketin ji odaya xwe razanê. Ew bi hevdû re çûna deverê bilind a qasrê û li wê di bin wê xweşîka rohniya serê sibehê de wan hinekî bêhna xwe stand. Di wê demê de piştî ku wê dem wê were dema taştê ku ew bi ber diwana ku ew li wê taştê bi kesên li dora xwe re bikin wê, di wê demê de wê, mîr ji çavên wî ne ravê ku wê, hinek mirov wê devên xwe bikina ber gûhên hevdû de wê tiştina ji hevdû re bibêjin. Di wê demê de ew bale mîr kişand û mîr di cih de bi ber wan ve çû. Gûlê xatûnê jî li pay wî çû. Piştî ku ew hatina cem wan kesên diaxifin wan ku mîr dît ku ew hat cem wan êdî wan jî pêşî silev dana mîr û rêz û hûmeta xwe dana nîşandin. Mîr berî ku ew bidest axifinê bikin axift û wî ji wan pirsî ku 'ma qay tiştin bûna. Min dît ku hun hinek bi awartayî bi hevdû re diaxifin. Yekî ji wan bidest axifinê piştî pirsîna mîr û ji wî re got ku "mîrê min, dûhû tiştêk bûya. Herkesek li ser wê diaxifê ku zembîlfiroş şevê din nîvê şevê bi qêrînî ji malê firîya derve û kes nizanê ku ew êdî li kûderê ya. Hinek dibêjin ku ew çû ya û ketiya ava diclê û diclê ew li ber xwe birîya. Gelek tiştên din jî bi wê rengê dihên vegetin.'

Mîr li ser wê hinekî şaş û mat ma. Bi çavên raq û heybet nerî li wan û cardin pirsî ku 'ma ti kesekê nizanê ku ew li kû ya.' Yê ku ew axift got 'na mîrê min, ti kesekê nizanê ku ew li kû ya.' Mîr di wê demê de wê, gotina ku wî got ew bû ku 'hun agahiyê bidina herkesekê ku ew bi hûner û dikarê xwe bi gihênê zembîlfiroş ku ew li kûderê ya bile bikevina lêgerîna wî de.'

Li ser wê gotina mîr wan mirovan jî got bila mîrê min ew û ji cem wî vaqatîyan û çûn ku ew agahiya mîr bigihênina herkesekê ku ew pey zembîlfiroş bikevin ku ew wî bibênin.

Di wê demê de Gûlê xatûnê berê xwe da mîr û got 'mîrê min were em hinekî herna hundir û li ser wê mijarê biaxifin. Mîr ji wê re got ku 'ez rewş pirr zêde mûhîm a bo min.' Gûlê xatûnê got ku 'ez dizanim mîrê min. Hinekî tiştên ku ez ji ter bêjim wê bi wê rewşê ve girêdayî bê.' Dema ku wê wusa got hingî mîr zêde mereq kir ku wê gûlê xatûnê tişta ku wê rewşê ve girêdayî çî bê ew dikarê ji wî re bibêjê. Piştire weke ku Gûlê xatûnê ew got mîr da rex wê û bi hevdû re çûna hundir li odaya xwe ya teybet a rûniştinê û li wir bi hevdû re bidest axiftinê kirin. Gûlê xatûnê hemû tişt ji serî heta binî ku ew çawa bûya ji mîr re hanî ser ziman. Û rastarast Gûlê xatûnê bahsa çuyîna dilê wê ser Zembîlfiroş jî kir ji mîr re. Di wê rewşê de mîr bi xamginî û dilêşî hemû tişt fêrbû.

Piştire mîr ya ku wî ji Gûlê xatûnê re got 'ber ku te bi xwe pêşî ev hemû ji min re hanî ser ziman, ez wê wusa di hasibênim, te dîtîya ku ew çendî şaşîyek mazin kirîya.' Gûlê xatûnê got 'rasta mîrê min, şaşîyek pirr zêde mazin a. Û ji wê zêdetirî jî wê weke encama wê şaşîyê wê gelek kes wê weke maxdûr bûn.' Dema ku mîr ji wê pirsî ku wê bi wê gotina 'maxdûrîyê' wê çî qast kir wê hingî bahsa jin û zaroyên zembîlfiroş kir.

Mîr piştî ku ew li hemû rewşê waqif bû û pê de wî, bidest axiftinê li Gûlê xatûnê kir û pêşî ji wê pirsî ku 'nûha ya di dilê xwe de ji min re vebêja.' Piştire Gûlê xatûnê ya dilê xwe bi wê rengê got "mîrê min ê delal û azîzî, ya dilî min ew a ku dilê min tama xwe di dema dîtîna wî ciwanî de bir ser wî. Lê ez nûha fahm dikim ku ew ya dil a û weke te carna gotî dil li fermanê na hisênê. Lê ez nûha li ser hemû waqif bûm. Êdî ya rast dizanim û dibînim. Di wê rewşê de Zembîlfiroş weke birayekê te û min jî ez wî dibînim û ji wê rewş min gelek ders û fêr derxst. Ti jî wê bi wê rengê herê bikê.' Mîr piştire got 'temem xatûna min ez ya ku te ji min re gotî weke rastîya dilê te herê dikim' ma sekinî. Piştire jî mîr wî jî sedema haznên xwe yên di serê xwe de wî ji Gûlê xatûnê re hanî ser ziman. Gotinên di derbarê zembîlfiroş de ku wî mêhwanên wî ji wî re hanîna ser

ziman wî ji Gûlê xatûnê re hanî ser ziman. Piştîre jî êdî ew rewş bi wê rengê weke ku ew hinekî din derket li têgihîştinê.

Piştîre ku ew hinekî din jî bi hevdû re diaxifin wê mîr û Gûlê xatûnê wê axiftina xwe wê di nêvî de wê bibirrin û wê derkevin. Mîr berî ku wê taştê wê were amede kirin wê were dîwana rûniştinê û wê di wê demê de wê di cih de wê agahiyê ji serbaz û gelek kesên li dora wî re wê bişênê ku ew di cih de werina cem wî, meseleyek muhim heya.

Piştî ku agahiya mîr digihijê serbaz ew di cih de di bazê û dihê cem mîr. Li hûzûra wî amede dikê. Piştîre ew ji mîre dibêjê 'dê mîrê min keremke, ew tiştî muhim çî ya.' Mîr jî wî re dibêjê ku ew hemû sûwariyên bikê lêgerîna zembîlfiroş de. Wî di cih de wî bibînin û bînina qasrê. Serbaz hinekî ji wê gotina şaş û mat dimênê ku ew çima hemû hêza ji wî re seferber dikê. Di wê demê de wê, dema ku wê, serbaz wê ji mîr dipirsê, mîr bersiva ku ew dide hemûyan şaş û matmayî dihêlê. Mîr dibêjê ku 'ew zembîlfiroş ji male mîrzadeyan a. Ew warîsê taxtê kurdistanê ya. Ew kesê ku wê li ser taxtê kurdistanê rûnihê û wê heft duwelên wê birêve bibê bê.' Dema ku mîr wê gotinê dibêjê êdî herkesek bi bilez û baz bidest lêgerîna li zembîlfiroş dikê. Mîr peyamnêr şandina ji gelek mîrgehên li dora xwe ku ew kesekê weke zembîlfiroş bibînin ew agahiyê bidina wî. Roj li ser rojan hatina kirin û heyv li ser heyvan hatina kirin. Di dawîya dawî de wê, rojekê ku wê dema ku wê herkesekê hêvîya êdî ji zembîlfiroş kiribû û êdî bidest bawerkirinê kiribû ku ew miriya êdî rojekê wê agahiyek ji mîrgeha badînanê wê agahiyek ji wî re wê were şandin ku ew hatiya dîtin. Ew li wir dimênê. Li herêma batûfayê a li herêma dahma zaxo ku ew jî di wê demê de di nava herêma botanê de jî weke di hat dîtin xwe li wir girtibû. Rewşa ku wî jîyankiribû hingî wî kiribş fihêtiyê de êdî wî ne dikarî li rûyê mirovan binerê. Herê nava civatên mirovan û bi wan re têtikiliyê dênê û bi axifê. Lê li vir wî xwe li derwêşekê girtibû û li cem wî mabû. Di wê dema ku ew li wir mabû de wê, pirr zêde wê, alaçayak mazin wê ji wî derwêşê êzîdî bibînin. Wê ew jî bi wî bide bawerkirin û wî qanihbikê ku wî tişteke xirab nekiriya ku ew wilqasî xwe dilêşî bikê û xwe ji mirovan dûrbikê. Vajî wê wî alî wî dikir ku ew serê xwe hilde û di nava mirovan de têtikiliyê dênê.

Di wê dema ku ew hinekê bi wê rengê dihê xwe jî wê, di wê demê de wê, serbazê mîr ji mayafarqînê wê were û bi gelek sûwarên bi wî re wê xwe bigihênina zembîlfiroş. Di wê demê de ew, zembîlfiroş qanih dikin û wê bi xwe re dibin. Ber ku wî jî dixwest ku ew herê û vegehî li vir. Ber ku li vir jin û zaroyên wî ku ew li male xwe mabin wê, wî bêrîya wan

kiribû. Lê gelo ma ew hê li wir bûn? Dibê ku jina wî bi zaroyên xwe re vegeyriyabê male bavê xwe ku ew li cem wan bimênê. Lê serbaz bi wî da bawerkirin ku jin û zaroyên mîr ew li cem xwe girtin û soz daya wan ku ew wê te bibînin û wek bigihênê li hevdu.

Lê tişteke din jî serê zembîlfiroş pirr zêde meşkul dikir. Ew jî wê ew ba ku ew rewşa ku ew di nava wî û gûlê xatûnê de bûya ku ew mîr pê hisiya bê wê qatî wê serê wî bide lêdan. Ev jî di serê wî de derbas bû. Lê tevî wê jî Zembîlfiroş wê, bi gelek mitale, xûf û gûmanan û ku wê mirina xwe jî da berçavên xwe û bi hêvîya u ew jin û zaroyên xwe bibînin ew hatina bi wan re herê dikê. Ji xwe wî hizir dikir ku ew rengê jîyanê bi wan hêstên ku wî dikirina rewşek xirab de wî mirinek ji wê baştir didît.

Lê bawerîya wî jî bi yazdanê dilovan hebû ku wî bi wî re wê rêheval bê. Ber vê yekê wî di ti rewşê de wî, xwe ji wê bi şûn ve ne da paş. Wî hertimî wî, ya ku wî bawer dikir ku ew rast a wî bikê.

Zembîlfiroş ew piştî ku wê serbaz bi gelek sûwarên li dora wî re wê, zembîlfiroş wê werênina qasrê wî dema ku ew nêzî qasrê dibin ew di dilê xwe de ji xwe re dibêjê 'êdî zembîlfiroşo dema mirina te hatiya.' Di wê temenê de wê xwe ji mirineka ku ew dema ku ket qasrê de wê, bê serê wî re wî xwe amede dikir. Bi wê hêstê weke kesekê ku ew b bi awayekê serbilindî herê sêdarê wê, di nava sûwaran de wê, herê qasrê.

Di wê demê de wê dema ku ew hatina ber devê deriyê qasrê wê çend sûwarêvanên din jî wê, wan pêşwazî bikin. Hinek ji wan wê paya û hinek ji wan jî wê li ser piştê hast wê wan pêşwazî bikin. Di wê demê de ku ew bi wê rengê di nava gelek deng, sûwar û qalabalixa wan de ket hewşa qasrê de wê, di cih de wê, dît ku wa mîr ji pêpelokan dihê xwarê ku ew were û wî pêşwazî bikê. Mîr bi rûdênek hişk û bi awayekê ji xwe biêmin û wê simbêlqaytaniya xwe ew hat û li hemberî wî sekinî. Di wê demê de ne gotin ji devê zembîlfiroş derket û ne jî ji devê ti kesekê derket. Tenê mîr bi gotina 'tu bi xêr û selemet hatî birayên ê hêja û dilhêja.' Bi wê gotina ji mîr ew pirr zêde şaş û matmayî ma. Di wê demê de tenê zembîlfiroş li dora xwe dinerî û dikir ku ew rewş fahmbikê.

Di wê demê de tişteke din zembîlfiroş dît. Ew jî birayê wî yê Merwan ku ew piştî ku ew winda dibê û agahiya wî li hewirdorê belev dibê êdî ew jî bi wê dihisihin û di cih de dihên wir. Êdî ew dema ku ew dihên wir ew dikin ku jinbira xwe bi zaroyên wê re ji wir bibin. Lê mîr sozdaya wan ku ew zembîlfiroş bibînin û bigihênê wan. Ber vê yekê ew tevde li wir mabûn.

Piştî ku mîr ew pêşwazîkirin û pê de ew birina hundir li diwanê. Li vir pêşî li deverê zembîlfiroş jin zaroyê xwe ku wê li rex wan merwan hebûya û wî ti carî ew bi tenê ne hiştibûna wê werina hemberî wî. Wî hemû jî himbêzkirin. Dema ku wî jina xwe dît ji kûrehiya dilê xwe lê nerî û hinek rondikên wî herikin ser hinerikên rûyê wî. Jina wî ewî dît û ew jî kelegirî bû. Hemû nêzî wî bû û destê xiftanê xwe kirina kefemista destê xwe û bira rûyê wî û rondikên ku ew herikîna ser rûyê wî pê paqijkirin bê ku ew bihêlê ku kesekê din wan bibîne.

Piştê mîr ferman da ku ew zembîlfiroş bibina cihê qasrê ê herî bilind û xweşik û cilên herî xweşik û yên asîlzane û mîrzadeyan lê bikin. Wê weke warîsê taxtê kurdistanê hat bicilûberg kirin û hat azimandin. Piştê jî wê, di wê demê de wê, mîr ew bir li diwanê li serê dîwanê biikê ku wî bide rûnandin. Lê berî ku ew bê birin Gûlê xatûnê firsandek dît û wê xwe gihanda wî û lêborîna xwe ji wî xwest û ji wî re got bi evîna dil a biratiyê heta mirinê tê di dilê min de bê. Em li vê dînyê û li dînya din jî li rex hevdu weke xwûşk bira bijîn. Piştî wê gotinê êdî weke ku ew hinekî dilê wî rehet bû.

Jina zembîlfiroş di wê demê de ew hertimî li rex wî bû. Hîç ji cem wî kêr nedibû. Di her rewşa wî de êdî wî bi tenê ne diberda. Zembîlfiroş wê di wê temenê de wê, demek xwe wê, bi wê rengê bi malbate xwe re wê derbas bikê. Piştê wê, xwediyên wê werin û bigihêninê de. Ew piştê wê, weke mîrê mazin wê bi gelek sûwaran re wê, bê birin li qasra mazin. Wê ji wê demê û pê de wê li giştî walêt û wê, dema zembîlfiroş a serweriyê wê destpêbikira. Wê ji dad û adeleta zembîlfiroş ku wê ew wê ji wê demê û pê de wê, bi wê welêt wê bi rêve bibê wê bi sedsalan wê êdî wê ji wê were axiftin.

Li giştîya welêt wê dema taxt a zembîlfiroş wê êdî wê destpêbikira. Ji wê demê û pê de wê ev dema wî weke dewama wê vegotinê û hanîna ser ziman wê bê hanîn li ser ziman.

Dema zembîlfiroş wê, bi aramî, wekhevî, azadî û dilxweşiyê wê ji wê were bahskirin. Wê di her demê de wê, ew wê bi wê rengê wê ji aliyê gelheyên kurdistanî ve wê bê pêşwazî kirin. Wê haqaniyata zembîlfiroş û hevduîtiya wî wê hertimî wê êdî wê, were ser ziman. Wê demek zêrîn wê bi wê re wê li giştîya welêt wê destpêbikê. Dilxweşî weke rojên newrozên wê bi şahî wê werina darxistin û pêşwazî kirin. Kêf û şahî wê, rêjeya wê derkeve li astek herî bilind li her deverên welêt bi hatina dema zembîlfiroş re.

Lê tê gotin ku wê zembîlfiroş wê piştire wê deverên weke ku batûfa û hwd wê piştire jî wê, ew bi malbatî jî wê di dema xwe de wê were van deveran û wê li wê bicih bibê. Di wê temenê de wê, ew wê, di wê rengê de wê, ji wir jî wê êdî wê were nasîn. Ev herêmên ku ew êdî xwe lê digirê ên weke heta zaxo û batufa wê di nava herêmên mîrgeha bavê jina zembîlfiroş de jî bin. Ew jî wê, di wê demê de wê xwe ji wê dûr nekin wê di her demê û rewşê de wê xwe li rex wan wê bidina nîşandin. Di wê temenê de wê, demek nû wê bi wê rengê wê li herêmê wê bi wan re wê destpêbikê. Ew dem jî dema nû û ankû wê weke di nava xalkê de wê were gotin 'dema asra zembîlfiroş' bû Weke dema asrî-seadetê a bi haqaniyeta zembîlfiroş re jî dihat dîtîn û bi navkirin ba. Dema ku wê bi başî, qanc û zanebûnê wê pêşkeve û wê derkeve li pêş bê. ..

• **Abdusamet yigit, Kurdistan, Cizîra bota, 2003.**

Ev berhem di sale 2003'an de hatîya nivîsandin di bin şert û mercên giran ên zindanê de